



Textê sima rijîno

Her waxt weçînitîsî muhîm bîyê. Hama emser jedena muhîm î. Şarî verra faşîzmî besekene nî weçînitîsan de biresê serkewtîşê pîlî. Weçînitîsê 14ê Gulanê rê zaf waxt nêmend. Nî weçînitîsî serva şaranê Vakûrê Kurdistan... **Meral Ozel / R.9**



Berxwedana bindestan

Serdest tim hewl didin ku bindestan bînin ser rîya xwe. Serkeftina projeya wan di vê bîşaftina bindestan de û ya jê girîngtir, di wê de ye ku bindest bipejîrînin ku rîyêke rizgariya ji serdestan tune ye. Ji bo vê yekê... **İbrahim Seydo Aydoğan / R.5**



Hevdişînê Xî û Pûtîn

Serdana dawîn a serokê Komara Gel a Çînê Xî Jînpîng di heman demê de statûya serdaneke dewletê ye. Ev serdana ji serdaneke fermî, kar, taybet an rêyî ya bi rûmetên taybetî cuda dibe... **Kurdistan Lezgiyeva / R.6**

xwebûn

27 Adar - 2 Nîsan 2023 Hejmar: 171 Buha: 7.5 TL rojname@xwebun.org

Şerê tirk û kurdan ê 1307 salan

Piraniya mirovên ku vê sernivîsê û nivîsê bixwe bixwînin ê bi min bawer nekin ku şerêkî bi vî rengî, yanî 1307 sal in dewam dike, heye. Hinek dikarin bêjin ku 'tiştêkî wiha nîn e; em biran e û misilman in'. Lê kî çî dibêje bila bibêje, dîrok rastiya li ber me radixe. Pêwîst e em qertên di destên xwe de vekin, aşkera bînin ziman û kesek jî hewl nede ku hem xwe, hem jî kesên din bixapîne. Ji bo her kesî baştir e ku em rast bîhîzîrin, rast binivîsînin û rast jî tevbigîrin. Ji bo hinekan rastiya dîrokî dibê ku tîrş be lê lêkolîn didin xuyakirin ku 1307 sal in şerê tirk û kurdan berdewam e. Em ve yekê ji ku dizanin? **Şoreş Reşî / R.8**

Mohra 14'ê Gulanê

HDP, bi armanca planên gemarî yê Tifaqa AKP-MHP'ê yê li dijî xwe vala derbixe biryar da ku bi Partiya Çep a Kesk tev li hilbijartinê bibe. Ji ber vê yekê di serî de gelê kurd wê gelên Tirkiyeyê di 14'ê Gulanê de mohra xwe li Partiya Çep a Kesk bidin û pêşeroja Tirkiyeyê ronî bikin

Di 14'ê Gulanê de wê hilbijartinê Serokkomariyê û Parlamentiye pêk bînin. Ji bo hilbijartinan zêdetirî salekê ye partiyên siyasî amadekariyên xwe yê der barê vê de dikin û tifaq ava kirine. Di vê çarçoveyê de bi pêşengiya AKP-MHP'ê Tifaqa Cûmhûr û bi pêşengiya CHP û ÎYI Partiyê jî Tifaqa Milet hatiye avakirin. Derveyî van tifaqan weke xeta sêyemîn jî bi pêşengiya HDP'ê Tifaqa Ked û Azadiyê hatiye avakirin. Lê ji bo ku xeta sêyemîn li Tirkiyeyê têk biçe AKP-MHP'ê bi daraza tirk doza girtinê li HDP'ê vekirin. Tevî ku hilbijartinê re rojên jimare mane jî daraza tirk biryara xwe ya dawîn a der barê HDP'ê de nade û dixwaza di pêvajoya hilbijartinê de HDP'ê bixwe xefikê. HDP'ê jî herî dawî bi armanca ku pêşî van planên AKP-MHP'ê bigire biryar da ku bi Partiya Çep a Kesk tev li hilbijartinê bibe. Di hilbijartinên 14'ê gulanê de ji bo serkeftina Tifaqa Ked û Azadiyê di serî de gelê kurd wê gelên Tirkiyeyê mohra xwe li Partiya Çep a Kesk bixin. Endama Lijneya Rêveberiya Bajar a Partiya Çep a Kesk a Amedê Sera Bûcak, der barê xebatên wan ên hilbijartinê yê jî bo jinan de axivî, diyar kir ku Partiya Çep a Kesk li ser bîngeha paradîgmaya azadiya jinan hatiye avakirin û wiha got: "Em ê paradîgmaya azadiya jinan di hilbijartina bê de bi awayê herî xurt derxin pêş." **R.2-3**



Tifaqa Azadî û pêşeroja gelan

Tirkiye ber bi hilbijartina herî girîng a dîroka xwe ve diçe. Lê ne tenê Tirkiye di serî de gelê kurd û hemû gelên li bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê dijîn ber bi hilbijartina herî girîng ve diçin. Ji ber ku ev ne tenê hilbijartina guherandina îktidarê, di heman demê de hilbijartina guherîna pergala Tirkiyeyê ye. Di dehsalên pêşiya me de dewleta tirk û pergala wê de bi çî awayî bimeşe, di asteke bilind de girêdayî vê hilbijartinê ye. Komara Tirkiyeyê li ser bîngeha înkâr û îmhaya gelan hate avakirin. Di sed salên borî de jî ev pergala nijadperest hate meşandin û bû sedema gelek bobelatan... **H. Halil Alaçati / R.7**

Gel bersiva herî rast da

Di 15'ê adarê de 2 helîkopterên ku 9 şervanên Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) ên Yekîneyên Antî Terorê tê de bûn li başûrê Kurdistanê ketibûn. Navenda Ragihandina HSD'ê, bi daxuyeniyeke ragihand ku helîkopter, şervanên wan jî bo perwerdeyê dibirin Silêmaniyê lê jî ber rewşa hewayê xirab ketine xwarê û 9 şervanên wan şehîd bûne. Ji ber vê bûyera xemgîn gelek derdorên cuda peyamên sersaxiyê dan Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û Hêzên Sûriyeya Demokratîk. Lê weke her car hin aliyên ku dixwazin vê bûyerê li gorî berjewendiyên xwe bi kar bînin jî hebûn. Yek ji van jî PDK bû... **Felemez Ulug / R.6**

Îran kirêtiya li ser jinan didomîne

Îran yek ji welatan e ku di nav xwe de gelek netew û baweriyên dihevine. Lê pergala heyî ya Îranê li gorî vê pir bawerî û neteweyîyê tevna gere. Bi taybetî jî jin di hedefa pergala Îranê de ne û li dijî wan êrîşên gelek tund pêk tên. Mînakê herî şênber a vê der barê de sala borî di îlonê de xwe di hovitiya li dijî Jina Emînî de da der. Ji ber kuştina Jîna bi pêşengiya jinan serhildana "Jin Jiyan Azadî" hat destpêkirin. Li gorî raporeke ku ji aliyê Rêxistina Efüyê ya Navneteweyî ve hatiye amadekirin ve dewleta Îranê îşkenceyeke tund li jin û zarokên ku ji ber tev li serhildanê bûne, dike. Li gorî raporê di bin çavan de peywardarên dewleta Îranê tecawizî jin û zarokan dikin. Li aliyê din jehrîkirina xwendekarên jin a li Îranê ya ji aliyê dewletê ve jî berdewam dike. **R.2**



Derûniya zarokan aş dîkin

Di 6'ê sibatê de li bajarê Gurgumê yê bakurê Kurdistanê du erdhejên mezin ên bi pileyên 7.7 û 7.6 çêbûn. Di van her du erdhejên bandora li tevahiya bakur û rojavayê Kurdistanê kirin de nêzî 60 hezar kesan jiyana xwe ji dest da û zêdetir 100 hezar kesan jî birîndar bûn. Ji roja ku erdhej çêbûye ve xebat û piştevaniya sazî û dezgehên bakurê Kurdistanê li herêma erdhejê didomin. Herî dawî Ma Musîcê bi armanca ku zarokên li herêma erdhejê di hêla derûnê de pêvajoyê sivik derbas bikin bi navê "Gerok Ma" xebatek da destpêkirin. Koordînatör û mamosteyê Ma Musîcê Şêrko Kanîwar, diyar kir ku di çarçoveya xebatên xwe de wê li tevahiya herêma bi qasî du salan bigerin û ji bo zarokan xebatên hunerî bikin. **R.11**

Xwediyê êşê bi êşa xwe dizane!

Nivîskarê mêvan ê rojnameya me yê rojavayê Kurdistanê Aras Hiso, der barê êrîşa ku di 20'ê adarê de li navçeya Cindirêsê ya Efrînê ya dagirkirî ji ber pîrozkirina Newrozê li 4 kurdan hatibû kirin de nivîsand. Hiso, diyar kir ku xwediyê êşê bi êşa xwe dizane û li dijî vê hovitiyê bêdengî heye û got ku heke ne ji qîrîna jinên Efrînê bûya wê kes bi vê hovitiyê nehisiya û komkujî bes li ber deriyên, di quncik û qewêlan de bi dizî bihata vegotin. **R.7**

Fatma Taşlı Tunç

Osmanê Mahmê û Rebîhanê **R.10**

Newroze roja roştî ya

Ma nuştux Huseyîn Ayrilmazî de edetê Newroze ser o qisey kerd. Ey bitaybetî bale ante rîtuêlanê Newroza Dêrsimî ser. Ayrilmazî nîya vat: "Ez hênî zone ke Dêrsimijan Newroze rê vatêne 'Hawtemal'. 21ê aşma adare de kincê xo yê rindekî girewtêne pîra. A roje heme pîya werdêne û pîya kay kerdêne." Nuştux Ayrilmazî manaya Newroze ser o kî no fikr pare kerd: "Newroze roja roştî ya. Têna roşanêk nîya. Têna roja wusarî nîya. Ez vone kam ke cayê Newroze Mezopotamya û cayanê bînan de berz keno, kam ke na roje keno roja azadîya, ez lew none binê nînganê înan ra û lew none destanê înan ra." **Raporajê Dr. İsmet Konakî / R.4**

'Em ê mohra xwe li hilbijartinê bixin'

|| Medya Bal

Gelên Tirkîyeyê dê di 14'ê gulanê de ji bo serokkomar û parlementeran hilbijartinê biçin hilbijartinê. Beriya hilbijartinê ku pêk bê hikumeta AKP-MHP'ê ji bo pêşî li gelan bi taybet jî li gelê kurd bigire li HDP'ê doza girtinê vekir. HDP'ê jî li hemberî vê biryara hikumetê biryar da bi Partiya Çep a Kesk bikeve hilbijartinê.

Em der barê hilbijartinê ku pêk were de bi endama Lijneya Arasteya Bajêr a Amedê ya Partiya Çep a Kesk Sera Bûcak re axivîn.

Sera Bûcak di despêka axaftina xwe de got ku gelên me dizanin ku li Tirkîyeyê gelek caran bûne şahidê doza girtina partiyên û ev tişt anî ziman: "Ev doza girtinê ya li HDP'ê hatiye vekirin antîdemokratîkbûna dewletê nîşan dide. Weke pêvajoya antîdemokratîk a ku dewletê li dijî partiyên kurd dimeşîne li peşberî me ye. Doza girtina HDP'ê ev demeke dirêj e di destê hikumetê de ye, hema bêje xebatên HDP'ê û partiyên din ên sosyalîst ên ku pêkhatiyên HDP'ê ne û di nava siyaseta demokratîk de cih digirin, dixwe bin siya xwe û vê pêvajoyê di nav nezelaî, nediyariyê de dihêle. Dike ku nikaribe gav baveje. Pekhatiyên HDP'ê li hemberî vê rewşê dev ji xebatên xwe bernedan. Wekî hûn ji dizanin dest danîna ser xizîneya HDP'ê jî. Ev tenê beşeke ji siyaseta tirsandinê ye. Weke hûn jî dizanin Dadgeha Destûra Bîngehîn red kir ku dosyaya girtina HDP'ê taloq bike piştî hilbijartinan."

Dê têkoşîna jinan bê parastin

Bûcak der barê tevlibûna wan a hilbijartinê de ev tişt anî ziman: "Li dijî girtina HDP'ê demeke dirêj me biryar da ku bi Partiya Çep a Kesk a ku weke HDP'ê paradîgmaya ekolojîk, azadiya zayendî û demokratîkbûnê diparêze bikevin hilbijartinê. Partiya Çep a Kesk partiyeye siyasî ye ku ji sala 2012'an ve di qada siyaseta Tirkîyeyê de ye. Li rojavayê Tirkîyeyê xebatên rêxistinîna partiyê temam bûne. Her wiha demeke dirêj e xebatên rêxistinîna Partiya Çep a Kesk li navend û navçeyên Kurdistanê temam bûne û ji bo roja îro amade ye. Di çarçoveya vê plan û xebatê de bi awayekî fermî wek partiyeye siyasî

Endama Lijneya Arasteya Bajêr a Amedê ya Partiya Çep a Kesk Sera Bûcak der barê hilbijartinê wiha got: "Em weke jinên Partiya Çep a Kesk îdia dikin ku em ê bi xebat û tevlibûna xwe mohra xwe li hilbijartinê 14'ê gulanê bixin."

mafê beşdarbûna hilbijartinên giştî a 2023'yan bi dest xist.

Partiya Çep a Kesk weke pekhateya HDP'ê ye. Ji ber wê jî wekî HDP'ê tekoşîna jinan û tekoşîna demokrasîyê diparêze. Ji bo em xwe bi gel bidin nasîn em ê bi jin, ciwan û rêxistinên xwe re gund bi gund navçe bi navçe bigerin û bi awayekî herî xurt bi civakê re têkilî deynin."

Pergala hevberdevkiyê


Bûcak di axaftina xwe de bal kişand ser pergala hevberdevkiyê û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Wek tê zanîna pergala hevberdevkiyê ne tenê di partiyên siyasî yên kurdan de di heman demê de di sazî û rêxistinên ku ji heman kevneşopiyê tên de tê bikaranîn. Rêbaza hevberdevkiyê

cara yekemîn di sala 2005'an dest pê kir di sala 2014'an de bi şaredariyan pêş ket û heta niha bi destkeftiyên jinan xwe pêştir xist. Ev pergala ku jinan tev li siyasê dîke bê guman dê di partiya me de jî bidome. Tenê cudahiyeke biçûk di nav de heye. Lê di rastiyê de mantiq yek e. Di hemû rêxistinên Partiya Çep a Kesk de formûla serokatî û hevberdevkî heye û nûneriya wekhevîyan zayendî tê hedefkirin."

Manifestoya jinan

Endama Partiya Çep a Kesk der barê xebatên xwe yên jinan de jî ev agahî da: "Partiya Çep a Kesk jixwe li ser bîngeha paradîgmaya azadiya jinan hat avakirin. Di hemû xebatên me de em hewl didin keda jinan bidin

nîşandan. Jixwe heta niha xebatên me yên jinan di bin sîwana Tevgera Jinên Azad (TJA) de dihatin kirin. Em ê paradîgmaya azadiya jinan di hilbijartinê de de bi awayê herî xurt derxin pêş. Ji bo vê em ê buroyên xweser ên hilbijartinê ava bikin. Em ê di van buroyan rola jinan a di polîtîkayê de pêş bixin û manifestoya hilbijartinê ya jinan ji bo jinên kurd, jinên kurdistanî û dostên xwe yên femînîst amade bikin. Em ê bi xebatên ku em li van buroyan dikin jinan di xebatên hevpar de bi awayeke herî xurt temsîl bikin. Em ê li taxan û kolanan mafê jinan biparêzin û bi awayekî herî xurt xwe tev li hilbijartinê bikin. Em wek jinên Partiya Çep a Kesk îdia dikin ku em ê bi xebat û tevlibûna xwe mohra xwe li hilbijartinê 14'ê gulanê bixin."



Li girtîgehan mirovahî tê bînpêkirin

|| Navenda Nûçeyan

Weke ku ji hêla raya giştî ve jî tê zanîna di girtîgehan de bînpêkirina mafên mirovan di asta herî jor de dewam dike. Li gorî agahiyên Komîsyona Girtîgehan a Komeleya Mafê Mirovan (ÎHD) a Şaxa Stenbolê li girtîgehên Tirkîyeyê û Kurdistanê 1273 girtiyên jin ên nexweş hene û ji van girtiyên 450 girtî bi ser 65 saliyê re ne û pêdivî û cudahiyeke fizîkî, biyolojîk û derûnî yên jinên li girtîgehan li ber çavan nayê girtin.

Baş tê zanîna ku li girtîgehan gelek mafên girtiyên bi taybet jî yên jinan tene bînpêkirin. Gava girtî jin bin pîrsgirêk zêdetir dibin. Lêgerîna tazî dijî tevahiya girtiyên tê kirin. Lê gava girtî jin bin, lêgerîna tazî wateya destdirêjî û bêrîmetkirinê jî. Heta niha buyarên bi vî rengî gelek in û hê jî berdewam e.

Pêşî Hevpeymana Stenbolê niha jî qanûna 6284'an

Bi betalkirina Hevpeymana Stenbolê jixwe pêşîya gelek tundiya li dijî jinan tê kirin hate vekirin. Niha jî qanûna hejmara 6284 tê nîqaş kirin. Ev jî dide xuyakirin ku deshilata AKP-MHP'ê dixwaze rejimeke ku bînpêkirina mafan û tundiyeke di hewine ava bike. Dîsa dixwaze ku hemû desketiyên jinan vala derbixe û tune bike. Şûna ku tundiya li dijî jinan tê kirin ceza bike zêtir bi bêcezakirinan diparêze û her wiha bîngeha wî ya qanûnî jî hewl dide ku ava bike.

Em baş dizanin ku desthilatdarî bi zanebûnê dixwaze civakê têxe nav aloziyan. Ew armanc dikin ku hawirdoreke kaosê çêbe. Ji ber ve yekê, niha tiştên ku îro li zindanan tene kirin jî ev e. Îro li girtîgehan ev kaos heye. Heke em jin bi hev re têbikoşin wê gavê em dikarin dijî van polîtîkayên desthilatdariyê derkevin.

'Em ê bibin dengê hemû girtiyên nexweş'

Di sala 2022'yan de ji bo azadiya Aysel Tûglûk û hemû girtiyên nexweş 1000 jin hatin gel hev û kampanyayêke daxwaza mafê jiyana girtiyên nexweş dan despêkirin. Bi ked û tevlibûna jinên gelek deverên cîhanê Aysel Tûglûk hat berdana lê mixabin hê jî bi sedan girtiyên bi nexweşîna giran nexweş in li girtîgehan tene girtin.

Lewma jinan dîsa mil dan milê hev bi "Insiyatîfa 1000 Jinan ya ji bo Azadiya Aysel Tûglûkê" bi peyama ku ji Newrozê re şandîye biryar daye ku ewê weke "1000 Jin ji bo Azadiya Girtiyên Jin yên Nexweş" xebatên xwe bimeşînin.

Insiyatîfa 1000 Jinan a ji bo Azadiya Aysel Tûglûkê bi daxuyaniyekê gotin: "Rastiyên ku di deshilatiya AKP-MHP'ê de ev 20 sa lin heye bi erdeheja 6'ê sibatê dîsa derket rû. Em ê bi berdewamiya kampanyaya xwe bibin dengê hemû girtiyên nexweş da ku di rojek pêş de bigihêjin mafên xwe yên jiyana."



|| Navenda Nûçeyan

Bi pêşketina netewdewletan û xêzkirina sînoran gelek neteweyên cuda di nav sînorên diyarîkirî de hatin hiştin. Di navbera neteweyan de tevî ku tenê sînorên xeyalî hatibin xêzkirin jî ji aliyê gelek mijaran de bi tunehesibandîna dewletên cuda re rû bi rû man.

Dewleta Îranê jî yek ji dewletên ku di nav sînorên xwe de gelek neteweyên cuda di hewine ye. Di nav sînorên Îranê de neteweyên weke fars, azerî, kurd, lor, ereb, belûc, tirkmen, ermen, aşûrî, kaşkaî, gurcî cih digirin. Tevî ku ziman, bawerî û çanda van neteweyan ji hev cuda ye û divê bi xwebûna xwe hebûna xwe bidomînin jî dewleta Îranê wan neçarî yek ziman û baweriyê dike.

Li ser bawerîya îslama ku li neteweyên cuda dide ferzkirin hewl dide ku civakê li gorî xwe dîzayn bike. Bi taybet li gorî îslama ku li gorî xwe dîzayn kiriye û li civakê ferz dike hewl dide jinan bike bin bandora xwe. Li ser vê yekê jî kincên ku jin li xwe dikin heta ku dê di kolanan de çawa tevbigerin û divê çawa bifikirin tev ji aliyê rejîmê ve tene kontrolkirin. Jinên ku li gorî fermanên wan tevnegerin jî ji aliyê rejîmê ve bi rêbazên cuda tene

Dinêrin lê nabînin

cezakirin. Yek ji mînakê vê yekê Jîna Emînî ya ku di îlona 2022'yan de bi hinceta ku porê wê li gorî pîvanên rejîmê nehatiye nixaftin, hat kuştin. Her wiha xwendekarên jin li dibistanên ku dixwînin piştî kuştina Jîna Emînî ji meha mijdarê heta niha ji aliyê rejîma Îranê ve tene jehrîkirin. Tevî bertekên ku li dijî vî mijarê derdekevin jî jehrîkirina jinan didome.

Zarokên xwepêşandêr

Jinên ku ji 40 salî zêdetir e di bin zilma rejîma heyî de ji her mafên xwe bê par in bi kuştina Jîna Emînî daketin qadan û ji pergala heyî re gotin bes e. Jinên ku ji meha îlonê ve pêşengî ji serhildana civakê re dikin rastî îşkence, tacîz û tecawîzê tene. Tevî van îşkenceyan jî jinan ji zarokan heta mezinan ji mêran heta jinan hemû beşên civakê rabûn ser piyan. Zarokên ku li dibistana perwerdeyê dibînin li dijî kiryarên rejîmê ji bo pêşeroja xwe daketin qadan. Lê li gorî daneyên ku ji saziyên neteweyî û navneteweyî tene parvekirin îşkence li

ser xwepêşandêrên jin û zarokan gelek zêde ne. Rejîm bi van îşkenceyên xwe yên ku heta li zarokên 12 salî jî dike hewl dide ku pêşî li vî serhildanê bigire.

Herî dawî Rêxistina Efüyê ya Navneteweyî der barê kesên ku di xwepêşandanan de hatine girtin û rastî îşkenceyê hatine de raporek amade kir. Di raporê de bi taybet cih daye rewşa zarokan û tundiya ku di bîngehan de dibînin. Rêxistina Efüyê ya Navneteweyî di rapora xwe de da zanîna ku zarokên bîncavkirî rastî lêdan, qamçîkirin, şoqa elektrîkê, tacîz tene.

Rastî tecawîzê tene

Di raporê de hat diyarkirin ku zarokên ji aliyê hêzên rejîmê ve tene girtin weke kesên mezin çavên wan tene girtin, hem rastî îşkenceyê tene û hem jî dibîna şahidê îşkenceya ku li kesên din tene kirin. Gelek zarokên ku ji bin çavan derketine di agahiyên ku dane Rêxistina Efüyê ya Navneteweyî de dibêjin ku ew di bin çavan de rastî tecawîzê hatine.

Gelek kesên ku di dema serhildanê de dimenên wan hatin parvekirin ji aliyê hêzên dewletê ve hatine bîncavkirin di bin îşkenceyê de bi darê zorê nameya poşmaniyê bi wan dane îmzekirin û dimenên wan ên ku poşmaniya xwe diyar dikin di televizyonê fermî yên Îranê de hatin parvekirin. Herî dawî 5 jinên ciwan ên ku li Tehranê dans dikirin ji aliyê rejîmê ve hatin girtin û poşmanî li wan hat ferzkirin.

Her sal raporê amadekirin

Ev nêzikatiya rejîmê li dijî jin û zarokan ne tenê di vî pêvajoya serhildanê de gihişt vî astê. Jixwe di dîroka xwe ya 40 salên dawî de tim bi rêbazên cuda di şexsê jin û zarokan de li civakê îşkence tene kirin.

Ev tunehesibandin û qirkirina dewleta Îranê ya li ser neteweyên cuda ji aliyê hemû cîhanê ve tene dîtin. Ji aliyê dewletê û saziyên mafên mirovan ên navneteweyî ve her sal ev îşkence, tacîz û tecawîzê tene raporkirin. Lê her çiqas ev rewş were raporkirin jî tu dewlet an sazî ji bo pêşî li vî rewşê bigire nakeve nav tevgerê. Gotinên wan tenê di asta 'em xemgîn û metirsîdar in' de dimîne. Ev jî cesaretê dide rejîmê.

Deng û hêza gelan: Partiya Çep a Kesk

Desthilata AKP-MHP'ê ji bo pêşiya dengê gelên azadîxwaz bigire çî ji destên wê tê dike. HDP ji bo vê planê pûç bike biryar girt ku di vê hilbijartinê de bi navê Partiya Çep a Kesk bikeve hilbijartinê û bibe hêza gelan

Navenda Nûçeyan

Tirkiye di 14'ê gulanê de dê biçe hilbijartinê. Di vê hilbijartinê de ne tenê Serokomar û parlamenter bî hilbijartin, a herî girîng dê çarenûsa Tirkiyeyê bê diyarkirin. Ji ber vê yekê ev hilbijartin ji bo gelên Tirkiyeyê gelekî girîng e. Ev hilbijartin dê di navbera desthilata zordar û gelên ji vê pergale nerazîne de derbas bibe. AKP, MHP di bin navê Tifaqa Cumhur de pêşengiya pergala zordest dikin. Heke CHP û Tifaqa Millet xwe neguherînin û li gorî daxwazên gel tev negerin dê ew jî bibin parçeyêke vê pergala zordest. Dema ku mirov li liv û tevgera Tifaqa Millet dinêre dibîne hewl dide ku xwe biguherîne. Lê rastiya wan dê piştî hilbijartinê derkeve holê. Ew jî baş dizanin ku heke xwe neguherînin dê dawîya wan jî weke yê din be.

Hewl didin HDP'ê bigirin

Ligel van her du tifaqa, tifaqêke ku rasterast gelan temsîl dike heye. Pêşengiya vê yekê jî HDP dike. HDP, dibin banê Tifaqa Ked û Azadiyê de hemû gelên azadîxwaz anî cem hev û bû rîya sêyemîn. Desthilata AKP-MHP'ê ji bo pêşiya HDP'ê û Tifaqa Ked û Azadiyê bigirin çî ji destên wan tê dikin û dê bikin jî. Plana wan a yekem ew e ku HDP bigirin û gelên demokratîk û azadîxwaz bê deng bikin. Desthilata AKP-MHP'ê herî zêde ji HDP'ê ditirse û ji bo vê jî hewl dide beriya hilbijartinê HDP'ê bigirin.

HDP ji ber ku bi planên qirêj ên desthilata AKP-MHP'ê baş dizane, tevdirên xwe wergirt. HDP ji aliyekî xebatên hilbijartinê meşand. HDP bi avakirina Tifaqa Ked û Azadiyê planên desthilata AKP-MHP'ê û planên ku hewl didin Tirkiyeyê wekî berê neçarî yekparêziyê bikin vala derxist. HDP, ji bo di vê hilbijartinê de gelên azadîxwaz bê alternatîf nemînin û hemû dek dolabên vê per-



galê vala derxin biryarên jiyani wergirt. Ji van biryaran yek jê jî li ser navê Partiya Çep a Kesk têkeve hilbijartinê. Bi vê biryarê re Partiya Çep a Kesk ku heta çend meh berê jî di nava civakê de zêde nedihat nasîn, ket rojevê û di demeke kurt de ji hêla gel ve hat pejirandin. Êdî her kes ji bo Partiya Çep a Kesk ji nêz ve nas bike ketin nava lêgerînê.

Ji bo jiyana azad têdikoşe

Partiya Çep a Kesk bi di 30'ê kanûna 2012'an de hat damezrandin. Partiya

Çep a Kesk bi hevberdevkiyê tê birêvebirin. Hevberdevkên Partiya Çep a Kesk Çigdem Kiliçgun Uçar û İbrahim Akin in. Partî wiha xwe pênase dike; "Ji bo jiyana û pêşerojê domdar û li ser bingeha civakeke ekolojîk, azadîxwazî, wekhevî û piştevanîyê hatiye damezrandin. Paradîgmaya Partiya Çep a Kesk hemû beşên civakê digire nav xwe û ji bo çareserîya hemû pirsgerêkan têdikoşe. Bi taybetî jî ji bo azadiya jinan û ekolojîyê têdikoşe. Partiya Çep a Kesk li aliyekî jiyaneke azad û demokratîk têdikoşe, li aliyê din jî li dijî

wêrankirina xwezayê li ber xwe dide".

Partiya Çep a Kesk, ji bo pêşiya plana qirêj a girtina HDP'ê bigire kete nava liv û tevgerê. Partiya Çep a Kesk di Konferansa Asayî ya 3'yemîn a 22'yê gulana 2021'î de pêk anî de biyara ketina hilbijartinê wergirt. Ji bo vê jî bi dirûşma "Em ê welatekî ku jiyana ekolojîk, demokrasi, ked û aştî lê heye ava bikin" lez da xebatên xwe. Di encama van xebatan de li 48 bajaran û 212 navçeyan rêxistinîya xwe ava kir û mafê ketina hilbijartinê bi dest xist. Bi

wergirtina destûra ketina hilbijartinê re planên desthilata AKP-MHP'ê vala hat derxistin. HDP ji ber ku gefa girtinê li ser wê heye û bi bêhneke nû têkeve hilbijartinê biryar wergirt ku li ser navê Partiya Çep a Kesk têkeve hilbijartinê.

Partiya Çep a Kesk dê di vê hilbijartinê bibe dengê nû yê gelan û weke HDP'ê bibe navê têkoşîna li dijî her cure yekparêziyê.

Ev hilbijartina dîrokê dê bi qasî şahidiya guherîna rejîmê, wê şahidiya hêza gelan a Partiya Çep a Kesk bike.

Dizgûnê Dewrêş

Piştî erdhêja li bakûrê Kurdistanê çêbû û zedetîrî pênçî hezar kesan jiyana xwe ji dest da, analîzên li ser siyaseta û bûrokrasiyê weke ava boş di ser raya giştî de tîn berdan. "Ditin" ji hemû vegotin û peşxanên nivîskî bihêztr e. Pêşketina teknolojîya di bin kontrol kesekî de; weke medya sanal derfetên manîpulekirina dewlet û bûrokrasiyê, bi tevahî nebe jî bi giranî ji hole rakirîye.

Her kesî, her tişt li ber çavê xwe dît. "Çi bûye û çî dibê!"

Derkete holê ku bi çerxa burokrasiya bertilxwar, siyaseta talanê ya Enqereyê xwedî dike û ew kiriyê cinawirê mirov. Her kes ji avahiyan biqisûr gazindar e ku kîjan mutehîdî ew ava kiriyê. Eva, tenê ji bo paqîskirina siyaseta diz a Enqerê û burokrasiya bertilxwar û xwevîroş e. Ji ber ku tê zanîn wê mitehîdî di rîya ceza de dîsa were ber destê wan û bi bertileke nû ew ê rihet were hiştin.

Pirsgirek ne mutehîdî in. Pirsgireka esasî plana dewletê ya ji bo tîpolojîya mirovê li wî welatî dijîn e. Dewlet ji xwe re mirovekî bêmêjî armanc dike. Lewre çawa dixwaze jê re îteat bike. Jixwe profîleke dîrokî ya takekes a tirk heye lê ji ber li vê erdnîgarîyê kêm e ji helandina gelên din tîpolojîyê nû hatiye afirandin û li kêleka yê berê daniye yan jî lê zêde kiriyê.

Li gorî wê tîpolojîyê "Dewlet çî dibêje rast e, wêzîfedar dewlet e îtiraz xiyaret e" vê destûrê karê dewletê û şêlankaran hêsantir kiriyê.

Kurdistan cihê herî zêde ku di bin vê

Pêşniyara Nacî Gorur

destûrê de tê perçiqandin e. Lewre ev der, bi siyaseta metîngerî tê birêvebirin. Loma ew qas xisara mezin li vê herêmê diqewime. Yekem sebeb ew e ku xirabkirina aboriya Kurdistanê siyaseta sereke ya dewleta tirk e ku "Plana îslahetê ya Şerqê" qasî mûyekî jî cihê xwe û ji armanca xwe şaş nekiriye, dikude.

Gotina "Şerq"ê jî ji bo xapandina kurdan e. Li kîjan bajarê Kurdistanê siyaseta xwe bi ser dixin wî bajarî jî vê planê tîne der. Yan kontrola koçê bi ser van bajaran de dişîne yan jî koçkirina ji wê derê dide rawestandî. Lê li bajarên dora van "giravan" dide koçkirin; yanê valakirin. Herêmên ku koç didin nûvekirina avahiyan re şewq û arezû nahêle. Ev jî rê dide ku ew xanî û mal, bêyî jinûvekirinê "heta çû ku derê" bî bikaranîn.

Yan jî ji ber xirabiya aborî nikarin ji nû ve çêbikin; loma mal û warê xwe berdin û diçin bajaran li cihên herî erzan, yanî cihên herî xirab bi cih dibin. Bi dehan însan neçar dimînin ku di xaniyekî de bimînin. Lewre debar ji ber vê rewşa xirab de tenê nayê kirin. A dawî jî stratejîyê mekanîzmayêke ku "mîrovên çê" esas digire û ji bo vê têdikoşe tîne. Ev dewlet bixwe ye. Dewletê weke mekanîzma amadekarê vê tabloyê ya esasî ye.

Kesê ku xanî çêdike jê fêm nake. Berpirsiyarê esasî û mesûlê yekem ku avahîsaz yanê mîmar e di prosedûra avahîsaziyê de bê fonksiyon hatiye hiştin.

Endezyar (muhendîs) kirine erkdarê vî postî! Lê di dinyayê de sîstem bi vî awayî naxebite. Belê endazyar di vê zincîrê de duyemîn xelek e lê nikare bibe biryardarê erka xelesa yekem a avahîsaziyê. Lewra perwerdeya wan ji hev cihê ye.

Di ser de jî asta qalîteya perwerdeya endazyariya Tirkiyeyê ji bilî hin zanîngehan di asta herî jêr de ye. Vana encamên karesatan îsbat dikin jixwe. Di sîstema avasaziyê de mekanîzmayê çavdêriyê (kontrol) bi bertilê tê çareserkirin û kontrola dewletê jî bi heman rêbazê tê helkirin.

Profesor Nacî Gorur tam li ser vê xetê neştergerî pêwîst dibîne û ji bo mudaxaleyê zemîna vê xirabiyê kontrolê pêşniyar dike. Dibêje mutehîd, muhendîs û mîmar; dev ji vana berdin. Hesabê xwe ji dewletê bipirsîn ku kî ji van karan mijûle bi pêşîra wî/wê bigirin. Ji bilî dewletê kes tîne. Wê çaxê dewletê bidê mehkemê. Pir hêsan e, gava dewlet xwe li ser gel ferz dike divê ji hemû jiyana jî ew berpirsiyar be.

Dayîna dest dadgehê belkî ji ber bêqalîtiya perwerde û sîstema dadmendî ku girêdayî wezaretê dadê ye jî di eslê xwe de burokrat tê darizandin. Loma jî dewlet ji burokrat û burokrat jî ji bo dewletê diçe ber dadgehê. Cezayê ku bigire ji burokrat were tanzîmkirin wê demê burokrak wê vegere ser yasayê. Ku derket holê yasa rê digire



vê carê xwediyê yasa çêkirinê parlamentoyê. Di dengdanê de kê îtiraza wê pêşnûme-yasayê nekiriye weke şexs divê ew jî bibe şîrikê wî cezaî. Weke partî jî di ser de. Şexs ji bêrîka xwe partî jî ji alikariya butçeya dewletê bî qasî pînc salan bê mehrûm û mahsûbkirin.

Parlamentoya Tirkiyeyê ji ber ku tu carî ji ber yasayên li dijî mirovahiyê desrxistîye berpirsiyar nehatiye dîtin û berdêl nedaye, tenê çûna îktidarê ne adil e. Keyfî û berdêl divê herî kême weke hev bin. Divê burokratên ku bi biryarnamêyên sê îmze tîne destnîşankirin û di yasayên ne li rê yan jî bêşûd de şewirmend û burokrasiya serokkomariyê jî were cezakirin. Yanî ji ber niqandin û tayînkirina kesên nebikêr (ne kêr hatî) divê cezayê biryar û kiryarên xwe bikişînin. Serokkomar ku bêyî lêkolîn û encamên dest ên şewirmend û mesûlên yasayê bisepîne ango îmze bike divê ew jî berdêla vê bide.

Bi vî awayî û ji bilî encamên referandûmên gel her kesê erkdar, ji biryar û fermanên xwe berpirsiyar e û divê ji sûd û xisara wê re amade be. Sûd mayîna li ser kar û yan jî li gorî teqdîra saziya xwe bê xelatîkirin. Lê cezaya xetayê tenê ya karmend ango mesûl e ku vê xisarê yan jî sûcê yan jî bêrîka xwe bide, yan jî jî vî karî were dîrxistin û darizandin û cezakirin. Ev ceza divê ji dîrketina erka xwe heya berdêlê zindanê be.

Wê çaxê mirov dikare behsa ser-erastkirineke hîmî bike. Pêşniyara Nacî Gorur di vê maneyê de firsendek e. Erdhej û hejmara sedhezaran qûrbaniyan vê ferz dike.

John Maynard Keynes, avasazî weke dînemoya start ango bazarê ya aboriyê bi nav dikir; nexasim piştî şeran. Motora ku bi vê rast bizivire ji jêzeminê derxîne eger ku çep zivîrî jî tersê wê bibe. Avasazî ew qas girîng e ku ji texmîna Keynes jî mezintir e. Ji wir dest pê bikin.

ŞARÊ MA YO PEYNÎ DE AZAD BIBO Newroze roştîya kirmancan a

■ Dr. İsmet Konak

Kurdî tarîxê xo de rastê xeylê tedayan û zextan mendî. Her tim serê erdê înan de tayê dewletan bi zor serdestîya xo awan kerde. Nê dewletanê serdestan ra ju Qiralîya Asurîyan biye. Bitaybetî Î.V. serra 7. de Qiralê Asurîyan Dehaqî neteweyanê Mezopotamya rê zulmo girs kerdbî. Kurdan vera Dehaqî zanîyê xo nêronayî û seba azadîya xo têkoşîno bêhempa kerd. Nê têkoşînê de Kawayê Asinkarî rolo muhîm kay kerd. Seraya Dehaqî dîyaye adirî ver û a roje cuya kurdan de biye Newroze. A roje ra heta nika no adir vêşeno. Na hûmara xo de ma nuştux Huseyîn Ayrilmazî de tarîx, mana û edetê Newroze ser o qisey kerd.

Mamoste! ma bixêr dî. Ez vone ma tenê mît yan efsaneya Newroze ser o qisey bikerîme. Şima na babete de tayê cigêrayîşê rûmetinî kerdî. Bitaybetî Dêrsim de Newroze kamcî mana teşmîl kena?

Nika şarê kirmancî yanî ma vajîme kurmanc, soran ûsn. pêro na efsane zanê. Baxusus nêzdîyê 40 serrî yo ke Newroze mîyanê şarê ma de yena bimbarekderdene. Aye ra raver kî estbî. La nê 40 serrî yo xeylê aktîf kêberê ma der a. Hem hatê azadîye hem kî hatê weşîye ra zê nanê nametî serê sifreyê kirmancan der a. Yanî Newroze xeylê muhîm a. Roje, şan û roştîya kirmancan der a. A efsaneya Qiral Dehaqî û Kawayê Asinkarî xo ra her kes zano. Pêro kirmancî zanê ke Dehaqî çiqas zalim o û na efsane senên virazîyaye. Ma tenê hatê Dêrsim ra nîya bidîme. Ez vone Newroza Dêrsimî ser o qisey bikerî. Rîtuêlê Newroze Dêrsim de zaf vîrê mordemî de nêmendê. Ez hênî zone ke Dêrsimijan Newroze rê vatêne "Hawtemal". 21ê aşma adare de kincê xo yê rindekî girewtêne pira. A roje heme pîya werdêne û pîya kay kerdêne. Roja 21ê Adare serva îtîqatê Dêrsimijan zaf muhîm a. Ez vajî a roje rê yenê secde. Ju kî vanê ke 21ê Adare serra newe ya. A roje şewe û sodir benê têduşt ra. Dar û ber, mor û milawun tede hewnê xo ra hesiyenê xo, a roje rê "ma bixêr dî" vanê. Endî kêberê wusarî kî beno ya. Yanî çeylê zimistanî qedîyeno û kêberê wusarî beno ya. Îtîqatê Dêrsimî de nîya qisey biyêne. Hatê bînî ra ez 5-6 serrî raver rojêke şîyo ju dergehe. Hatê Nazmîye de dergeha Qurê Babayî biye. Ju xatune mi rê sefirîye kerde. Hênî vajî. Aye kêber kerd ya û ez kuto zerre. Ez vajî zerre de zê nîsangehe çîyêk estbî. Hama aye çîtikêda kewe dabî pira. Hênî tîk viraştî. Mi rê vat ke "keleyê xo bibirne!". Tebîî a mi nas kena. Dima mi pers kerd "Naca çik o?", aye vat "No adir o." Pîr û babê ma ke raver ameyî îta, a roje 21ê aşma adare biya. Zerreyê banî de qotike de ju lojine



Nuştux Huseyîn Ayrilmazî ard ziwan ke Newroze seba azadîye zaf muhîm a û wina vat: "Newroze roja roştî ya. Têna roşanêk nîyo. Têna roja wusarî nîya. Eke mordem çîyo nîyanênî vajo, zerreyî Newroze keno tal."

virastê, adir kerdê we û a roje dormeyê adirî de sema şîyê. Reyna vajî na mezele nîya û manena nîsangehe. Uca de adir kenê we û dorme de sema şonê. Nika ma şikînîme nê persan pers bikerîme "eke roja sifitêne nê edetî estbî, gelo key ê vîndî bîyî? Yan şarî no edet key xo vîr ra kerd? Çik kut mabên û roja Newroze çayê qisey nêbiye uca ra tepîya? ". Beno ke qisey biye, ma nêzanîme yan ez nêzone. Birastî ti ke tenê kaniye ver şîya yan dewranê verênan ver şîya, no edet vejîyeno vernîya to. A roja ke a xatune qisey kerd û mi nîsangehe dîye, ez zaf sad bîyo. A roje mi rê zaf muhîm biye. Ez vajî pardeyê çimanê mi kerd ya.

Şima qalê Hawtemalî kerd. Ez nê edetî mereq kone. Dêrsim de waxtê Hawtemalî de se kenê?

Oncîna vajî ke şarê ma yê Dêrsimî roja Newroze xo vîr ra kerdbî. Na roje Dêrsim de bîbî Hawtemal. Yanî beno ke înan nameyê ci avurnabî. Cayê Hawtemalî kî mabênê şarî de berz o. Her serre 13ê adare ra dest pê keno hata 21ê adare dewam keno. No waxt yenê keyeyê jubînî, pîya nişenê ro û wurzenê ra. Kincanê neweyan gênê pira. Birastî goreyê fikrê mi na rêçe raver ra yena. Ez reyna vajî, cayê Hawtemalî kulturê şarê Dêrsimî de xeylê berz o. O kî yeno 21ê aşma adare. Nê serranê peyênan ciwanî vejîyayî û kutî dewaya xo ya verêne. Înan waxt ke wayîrê kirmancîye bivejîyê. Yeno mi vîrî ke serra 1977î de hatê Qisile (Nazimîye) de ciwanan aşma adare de adir vêşna. Ez vone Dêrsim de edetê adirvêşnayîşî uca ra dest pê kerd. Ez o waxt 18 serrî bîyo. Şarî o waxt mabênê xo de pers kerdêne "no çik o?". Yanî "çayê adir kenê we serê koyan de?". Peydo ma tede musayîme ke no adirê Newroze yo.

Yanî şima vanê ke serra 1977î ra ver Dêrsim de adirvêşnayîş yan bimbarekderdîş Newroze çin bî?

Ma qet pênehesiyayîme ke çîyo nîyanên esto. Vajî ke kesî a roje adir nêvêşnayêne. Kamcî dewrî de ma ra vejîyo û şîyo yan key ma rêça Newroze vîndî kerdo nêzone. Eke goreyê vînayîşê xo qisey bikerî, ez vone, no edet demê verênî de bî vîndî. Hama 1977 ra tepîya no adir vêşîya û wayîrvejîyayîşî dest pê kerd. Ez vajî mezgê înan de cayêkî de beno ke çîyo nîyanên estbî ke ê wayîrê ci vejîyayî. Zobîna kes nê edetî nêyano û nêkeno kêberê to. Xo ra naye kes qeubul kî nêkeno. Yanî cayêkî de estbî, wedarîyaye bî yan vîndîbîyaye bî. Ciwanan newe ra binê herdî ra vet serê herdî. Edet ame sifreyê ma ser. Uca ra tepîya serra 1979î de kî adir vêşîya. Şar aye ra tepîya kut Newroze dime.

Nê serranê peyênan dewleta tirke hemverê Newroze hêrişanê kulturîyan kena. Çekuya "Newruz" gurênena. Yanî vana ke Newroze têna bimbarekderdîş wusarî yo. Bi şima Newroze mabênê kurdan de kamcî mana teşmîl kena?

Newroze ma rê zê roştîya astarî ya. Aye tarî de ma rê raye muskite. Persê zê "Ma kam îme, kotî ra yenîme, çî zulm dîyo, manaya Newroze çik a" deyra muhîm ê. 40 serrî yo kirmancî yan kurdî seba kultur, ziwan û azadîya xo têkoşîn kenê. Ma heqê xo wazenîme. Ma vanîme ke kurd û kirmancî kulturê xo de kamcî edet û toreyî estê bi weşîya xo biramnê. Newroze roja roştî ya. Têna roşanêk nîya. Têna roja wusarî nîya. Eke mordem çîyo nîyanênî vajo, zerreyî Newroze keno tal. Ma homa azadîya xo ra zê awe teşan îme. Ez vone kam ke çayê Newroze Mezopotamya û çayanê bînan de berz keno, kam ke

na roje keno roja azadîya, ez lew none binê nînganê înan ra û lew none destanê înan ra. Newroze êdî biye roştîya şarê kirmancî. Baxusus hatê ma de Newroze zê tasa aşme asena. Key ke mordem piro seyr keno, zerreyê ci ra azadîye, aştiye, germîye û weşîye yena. Aye ra ez vone, kamî ke Newroze arde kêber, heq nîngan ey kemere de nêverdo.

Par ma Amed de 1ê Gulane bimbarek kerde, zêde kes nêamebî. Eleqê zaf senik bî. Ma dî ke Amed de hişmendîya sosyalîzmî girs nîya. Dêrsim de na hişmendîye esta. Şar bi coşî na roje bimbarek keno. Hama uca de kî Newroze rê eleqê senik o. Bi şima na çimdarîya mi rast a? Çayê eleqê senik o?

Heya heqîya xo hênî ya. To rind ard zon. Ez nê eleqeyî bone û girêdone serranê 1970an ra. Yanî key ke ciwanî ameyî Dêrsim û têkoşînê sosyalîzmî dest pê kerd, eleqeyê şarê Dêrsimî kî vurîya. Ez kî ê serran ra tepîya kuto mabênê înan. Ma serran a uca de mandîme. Keda ke ma daye xeylê girse biye. Ez ge-ge peyser seyr kone û xo bi xo vone "werrekna mi serva şar û kulturê xo kede biwerdêne." Eleqedarbîyayîşê sosyalîzmî uca ra yeno. Ez vone Newroze hende eleqeyê çepgirîyan nêanjena. Serranê 1970, 1980, 1990an de şar 1ê Gulane de ameyêne têlewe û uca de ma Alîşêr û Ana Zarîfa dîyêne. Destê ma de kî pankartê pîlanê sosyalîzmî estbî. Ma ê fetelnayêne. Tebîî ez barê xo de qisey kone. No fikrê min o. Çimê mi çîyêk vano, zerreyê mi çîyêk vano. Ez sîkanê Kurdistanî de fetelîne û tarîxê înan ro seyr kone, dewlete hatê Dêrsimî de hîna zêde kay kerdo. Yanî mezgê Dêrsimijan kerdo vila. Ma vajîme serra 1994î de gama ke dewa ma vêşnaye, ez zaf gurîyêne. Ma hevalî vera dewlete hende zaf gurîyêne ke axirî dewlete mecbûr mende û dewî vêşnayî. O waxt hatê ra kî ma kovara bi nameyî "Dêrsim" vetêne. Mi kamilanê Dêrsimî de tayê roportajî kerdêne û ci ra kamiya ma ser o persî pers kerdêne. 100 mordemî ra ez vajî 60-70 mordeman vatêne ke "ma tirk îme." Ez vone na xamiye 1938î ra girewt. Bado serranê

1970 û 1980an de her kes bî sosyalîst. Ma! kirmancîye kotî de mande, tarîxê Dêrsimî kotî de mand û 38 se bî? Her kesî ci rê "îşyan" vat û ci ra vejîya. Wa se vanê vajê, zerreyê kirmancîye de û şarê kirmancî de tarîxê xo wedarîyaye yo. Çîqa ke 1ê Gulane rê muhîmîye dîyena, hende kî Newroze rê ganî muhîmîye bêro dayene. Hama herdê ma de her dem kêmiye estbî. Newroze kinar de mendêne. Bado şarî şerm kerd û nê serranê peyênan fikrê xo tenê vurna ya.

Tebîî îta de têna şar sucdar nîyo. Sîyasatmedar, nuştux, hunermend û pêro aktîvîstê komelî mesuldar ê. Ez şexsî ge-ge seyr kone, ê zêde serkêşîye nêkenê. Hatê kultur û ziwani de mesuldarî nêgênê xo ser. Şima na babete ser o se vanê?

Mi xo ra sata bîne vat, na dewlete mezgê mordemî xeylê vila kerd. Pêro nuştux, vatox, zanyarê ke hatê ma ra vejîyayî semîye şikite hatê dewlete ser. Ez înan rê vone "karmendê kolonî." Sucê înan zaf o. Ê yê ke xo ra bêrê Amed de qisey bikerê, kes helmet nêdano ci. Hama Dêrsim de binê xo esto. Ê yê ke kotî ser o nişenê ro, çayê xo zanê. Tayênan zaf fam nêkerd ke înan çî kar kenê yan asimilasyonî rê xizmet kenê. Xo ra şima nê Planê İslahatê Şarkî zanê. Goreyê nê planî vanê ke "500 hezar tirkan berîme sîkanê kirmancan; tarîx, îtîqat û ziwane nînan windî bikerîme." Dima tayê sîkan ra bar kenê û kunê raye. Dî profesorî mabênê xo de qisey kenê û vanê ke raver Dêrsim ra dest pê bikerîme. O ju profesor pers keno "çayê Dêrsim ra dest pê bikerîme?". O bîn cewab dano "Kêberê elewîyan yan şarê Dêrsimî çîyê neweyî rê akerde yo. No şar zaf rew meyîl dano."

Yanî kam ke teber ra ame, ma kêberê xo yan olaxa xo ci rê kerde ya. Xamiye zaf kute mabênê ma. Nika seba eştişê na nêweşîye rê xeylê waxt lazim o.

Dêrsim de problemî rastî girs ê. Oncîna ma hêvidar îme. Demê ameyoxî de gere tayê çîyê bêrê bedîlnayene. Ez vone tenê qerardarîya şarê kurdî ser o qisey bikerîme. Mîsal serra 1992î de qezaya Cizirî ya Şirnexî de teqrîben 100 mordem ameyî qetilkerdene. Hama kurdan oncîna game peyser nêşte û her serre Newroza xo bi coşî û kelecani bimbarek kerde. Emser kî Newroze de coş û tewrbîyayîşo girs estbî. Kurdî îta de dewlete rê kamcî mesa-jan danê?

Şaro kirmanc qetî game peyser nêzereno. Çîqa ke doman û pîlanê xo vîndî bikero, oncîna raya xo ca vernêdano. Dewaya ci esta û heqê xo wazeno. Kes sêdeqe yan loqme nêwazeno. Ez naye kî vajî bextê ma tene sîya wo. Ma mordemanê henênan de bîyîme cîran ke. Yanî ma vajîme, eke şaro kirmanc Ewropa de biciwîyêne, beno ke heta nika resabî heqanê xo. Beno ke heta nika wayîrê azadîye û aştiye bîbî. Hama nika keso ke ma pîya cîranîye kenîme, tarîx de pêro ma qîr kerdîme. Înkariye xo rê kerdo kar. Kurdî gama ke Newroze bimbarek kenê, zerreyê tayênan ra gonî şona. Ê çimsîyayîye kenê. Se kenê wa bikerê, şarê ma yo peynîye de bireso azadî.



Huseyîn Ayrilmaz kam o?

Serra 1959î de qezaya Pulurî ya Dêrsimî de ame dinya. Xeylê serran hem polîtîka hem kî nuştuxî de eleqedar bî. Tewrê tayê komelanê Dêrsimî bî. Bitaybetî tarîx û kulturê Dêrsimî ser o tayê xebatî kerdî. Kitabê ci yê bi sernameyê "Balişnaya Kirmancîye" serra 2019î de weşaniya. Hatê bînî ra rojnameyê Dêrsim de nuseno. Eynî wextî de Merkezê Cigêrayîşanê Dêrsimî de xebatanê xo dewam keno.



Xweşkanî
Felemez
Ulug

Di 15'ê adarê de 2 helîkopterên ku 9 şervanên Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) ên Yekîneyên Antî Terorê tê de bûn li başûrê Kurdistanê keti-bûn. Navenda Ragihandina HSD'ê, bi daxuyeniyekê ragihand ku helîkopter, şervanên wan ji bo perwerdeyê dibirin Silêmaniyê; lê ji ber rewşa hewayê ya xirab ketine xwarê û 9 şervanên wan şehîd bûne.

Ji ber vê bûyera xemgîn gelek derdorên cuda peyamên sersaxiyê dan Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û Hêzên Sûriyeya Demokratîk. Lê weke her car hin aliyan ku dixwazin vê bûyerê li gorî berjewendiyên xwe bi kar binin jî hebûn. Yek ji van jî PDK bû. PDK û dewleta tirk a dagirker di çarçoveya hevkarîya li dijî gelê kurd û tevgera azadiyê de weke her carê mil dan hev û ketin nava hewldanên ku vê bûyerê çawa berevajî bikin.

Ji devê xwe jehr barand

Piştî vê bûyarê Waliyê Dihokê yê PDK'î Elî Teter dîsa mîna her carê jî devê xwe jehr barand û weke berdevkê dewleta tirk ê li başûrê Kurdistanê axivî. Di vê pêvajoya ku ji her demê zêdetir pêwîstiya gelê kurd bi yekîtiyê û piştevaniya hêzên kurdistanî heye de nêzîkatîyên bi vî rengî dijber û dijminane birîna gel kurtir dikin. Di vê bûyerê de gel ji PDK'ê bendê bû ku li şûna bi zimanê dewleta tirk bi axive herî kêm sersaxiyê bide malbatên şehîdan. Lê rêveberiya PDK'ê rûyê xwe yê reş nîşan da û ev êş jî nedîtî ve hat.

Serokwezîrê Hikumeta Herêma Kurdistanê yê PDK'î Mesrûr Barzanî jî di nava heman helwestê de bû. Tevî HSD'ê bi awayekî aşkera sedema firîna helîkopterên û kesên di bûyerê de şehîd bûne agahiyên zelal parve kir jî rêveberiya PDK'ê di nava hewldanên berevajîkirina bûyerê de bû. Mersûr Barzanî, di gava ewil de bêyî guh bide daxuyaniya HSD û rastiya bûyerê fam bike got; "ew helîkopter çima li wir difirin?"

Daxuyaniya Barzanî

Di helwesta rêvebirên PDK'ê de

Gel bersiva herî rast da

Ger hûn di bin navê ewlehî û silametiya gel de dixwazin firîna helîkopterên li ser herêmê bê qedexekirin çima li himber balafir û helîkopterên dewleta tirk bê deng û bê helwest dimînin



derdikeve holê ku ev mijar bi MÎT'a tirk re gelek gotûbêj kirine. Jixwe Mesrûr Barzanî di nixandinên xwe de qala lêkolîna bi destê dewleta tirk a dagirker kir. Bûyera ku li herêma di bin seweriya PDK'ê de qewimiye çima pêwîstî bi lêkolîna MÎT'a tirk tê dîtin? Piştî vê nixandina Mesrûr Barzanî derhet holê ku îstixbarata tirk piştî qezaya helîkopterê, çûye herêmê û li cihê bûyer qewimiye dest bi lêkolînan kirine. Piştê derket holê ku di çarçoveya lêkola MÎT'a tirk de PDK'ê daxwaza radestkirina cenazeyan di gava ewil de red kir.

Wekî din Mesrûr Barzanî YNK tewambar kir û got, YNK'ê ev helîkopter kirîne û çawa ketine destê QSD'ê em nizanin. Ev helîkopter bêyî destûr li ser

van herêman difirîn. Bi maneyeke din, Mesrûr Barzanî radigihîne ku herêm li helîkopterên dewleta tirk serbest e lê li yê YNK'ê ku pêkhatiya hikumeta herêma Kurdistanê ye qedexe ye.

Kes jê bawer nake

Di vir de divê mirov vê pirsê jî rayedarên PDK'ê bike. Ger hûn di bin navê ewlehî û silametiya gel de dixwazin firîna helîkopterên li ser herêmê bê qedexekirin çima li himber balafir û helîkopterên dewleta tirk bê deng û bê helwest dimînin. Tevî ku bi dehan caran di encama êrîşên balafirên dewleta tirk de şênîyên herêmê hatine qetilkirin û şehîd ketine çima heya niha jî bo girtina qada hewayî hûn neketin nava tevgerê?

Bûyer zelal e. Divê PDK êdî dev ji vê dijminantîya xwe ya li dijî gelê kurd berde. Ji bo rewşa derxistina van kiryarên xwe yê dij-kurdî êdî nekeve nava hewldanên reşkirina hin aliyan cuda. Divê baş bizanibe ku gelê kurd ne gelekî wisa nezan û apolîtîk e. Di Rojhilata Navîn de civaka herî baş rewşa siyasî û pêşveçûnê li herêmê rûdîdin analîz dîke û dinirxîne kurd in. Lewma kîjan partî çî dîke, di nava hewldanêke bi çî rengî de ye baş dizane. Ji ber vê yekê divê PDK bi van îstîkan xwe yê elîcengîz êdî bi aqilê gelê kurd re nelîze. Ew çî bike jî heya bi dewleta tirk a dagirker re hevalbendiyê bike û li pêy reşkirina tevgera azadiyê be wê kes jê bawer neke.

Dijmin nabin dost

PDK tevî ku xwedî dîroka dîrûdirêj a siyasî ye jî hîn neketiya ferqa girîngiya dijmin. Pêşiyên me ji ber xwe ne gotine "dijminên bavan nabin dostê lawan." Divê rêveberiya PDK'ê bizanibe ku wê dewleta tirk tu carî jê re nebe dost. Tevî hevkarî û dostaniya PDK'ê ya bi dewleta tirk a dagirker re jî gel êdî dizane kî dost e û kî dijmin e. Tevî hemû reşkirinan jî li Heseke, ji bo 9 fermendar û endamên Yekîneyên Antî Terorê bi beşdariyê xurt merasimek hat lidaraxistin. Gel dîsa xwedî li şehîdên xwe derket. Bi awayekî girseyî şehîdên xwe pêşwazî kir û bi vî awayî bersiva herî rast da nerînen ku hewl didin têkoşina şehîda berevajî bikin.



Kurdistan
Lezgiyeva

Serdana dawîn a serokê Komara Gel a Çînê Xi Jinping di heman demê de statûya serdaneke dewletê ye. Ev serdana ji serdanek fermî, kar, taybet an rêyî ya bi rûmetên taybetî cuda dibe. Alîkarê Serokê Rûsyayê Yury Ushakov, der barê gera heyî ya serokê Çînê de ev tişt got: "Ne protokol, a sereke muzakere ye." Ji bo Serokê Çînê ev duyemîn serdana dewletê ya Rûsyayê ye. Ya yekem tam deh sal berê pêk hat, dema ku wî cara yekî serokatîya welatê xwe kir.

Di roja serdanê de serokên Rûsya û Çînê di çapameniya her du welatan de bi rengekî hêja ji bo analîzê bi gotinên zelal axivîn. Vladîmîr Pûtîn, gotarek di Rojnameya Gel de nivîsand. Weşana çapkirî ya fermî ya Komîteya Navendî ya Partiya Komunîst a Çînê ku dikare weke analoga Pravda ya Yekîtiya Sovyetê were hesibandin. Xi Jinping, di Rossiyskaya Gazeta û malpera RIA Novostî de nivîsa "Bi israr ber bi Perspektîfên Nû yê Dostanî, Hevkarî û Pêşketina Hevbeş a di navbera Çîn û Rûsyayê de dimeşin" weşand.

Gotarên wiha bê guman, ne ji hêla serok dewletan ve lê ji milê hin kesan ve tînin nivîsandin. Belê, ew fêkiya hewldanên kolektîf ên çend sazîyên ku

Hevdîtinên Xi Jinping û Vladimir Pûtîn

ji siyaseta derve û referansê berpirsîyar in. Analîzkirina hemî nivîsan û peyvên kesane yê di wan de dihêle ku mirov

wênayekî analîtîkî ya tîkiliyên her du welatan temam bike bibîne. Pir nerast e ku bawer bike ku du gotar dikarin ji

bo teşhîskirina tîkiliya dualî ya dêwên cîhanê werin bikaranîn.

Cudahiya metnan di nuansan de ne. Pûtîn, rast e rast Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê bi "kontrola dualî" ya Rûsya û Çînê tawanbar dîke û destnîşan dîke ku nîzama cîhanê ya navendî-Amerîka bi neçarî di bin zexta rastiya objektîf de hilweşe. Xi, di nav kevnepoşîya axaftinê ya çînî de pir nermtir, bêyî sûcdarkirinên rast e rast dinivîse: "Çalakiyên hegemonya, despotîzm û çewisandinê zirareke cidî dide cîhanê... li dinyayê tu welatek jî hemûyan ne bilindtir e. Modelekî gerdûnî ya hukumetê tune û nîzamek cîhanê ku peyva diyarker aîdî welatekî ferdî be tune ye.

Her du lîderan berî dawîya gotarên xwe du paragraf li ser Ukraynayê dinivîsin lê Xi balê dikişîne ser plana aştîyê ya çînî, paragrafeke mezîn jê re vediqetîne. Mîna plansaziya çareserîya krîzê bixwe, di nivîsê de jî Xi, bi şêwaza "pîrgirêkên tevlihev çareseriyên hêsanan in" pozîsyona şer her gengaz e. Xi, navên sûcdar an riyên taybetî yê kêmkirina rageşiyê nade. Ev ne kêmbûna zanîna aştîparêziyê ye lê helwestek e. Xi, dinivîse ku plana çînî ku fikarên partîyan li ber çavan digire, "yekîtiya nêrînen civaka cîhanî ya li ser derbaskirina krîza Ukraynayê herî zêde nîşan

dide."

Pûtîn, di sê paragrafan de spasiya Çînê dîke ji bo nêzîkatîya hevseng, di heman demê de bi bîr xist ku nakokî li Rojava gurtir bû û ne Rûsya bû ku danûstandinên aştîyê tîk bir. Serokê Rûsyayê "yekîtiya cîhanê" nabîne tenê daxwaza ferzkirina nîzameke yekdest li ser cîhanê dibîne.

Çîn qeyrana Ukraynaê weke ya xwe nahesibîne û ji ber vê yekê divê mirov hêviya destwerdaneke aktîf neke (ku xurtkirina hevkarîya enerjîyê û hevkarîya leşkerî di qadê de dîr naxe. Îstixbarata an jî kompleksa leşkerî-pîşesaziyê). Ji aliyê din ve qeyrana muhtemel a li Taywanê de ne xema Rûsyayê be.

Tîkiliyên di navbera her du hêzên mezîn de ew qas kûr in ku ravekirina bi coşa "di dîrokek de ya herî baş" bi rastî jî piştrast dîke. Nebûna zehmetiyên sînoran, hebûna nîrxên hevpar di siyaseta navneteweyî de rêzgirtina ji prensîba ewlekariya ji hev cuda, serweriya neteweyî û rola Neteweyên Yekbûyî ya her du aliyan, xurtkirina berdewam a hevkarîyên bazîrganî û leşkerî ew bîngê in ku Rûsya û Çîn dikarin li ber xwe bidin, destê xwe bidin piştê xwe, ji xwe bawer bin ku hev nefroşin.

Di vê rewşê de wê her kes bi serê xwe bi dijminê xwe re şer bike.



Tifaqa Ked û Azadiyê û pêşeroja gelan

Tevgera Azadiyê bi stratejiyeye demdirêj tevdigere. Dê hem bi stratejiya tifaqê xwe mezin bike û hem jî dê mafên gelê kurd heta dawiyê di asta herî jor de biparêze. Bi vî awayî dê destûr nede ku kurd wekî berê bi tenê bibînin

H. Halil Alaçati

Tirkiye ber bi hilbijartina herî girîng a dîroka xwe ve diçe. Lê ne tenê Tirkiye di serî de gelê kurd û hemû gelên li bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê dijîn ber bi hilbijartina herî girîng ve diçin. Ji ber ku ev ne tenê hilbijartina guherandina iktidarê, di heman demê de hilbijartina guherîna pergala Tirkiyeyê ye. Di dehsalên pêşiya me de dewleta tirk û pergala wê dê bi çî awayî bimeşe, di asteke bilind de girêdayî vê hilbijartinê ye.

Komara Tirkiyeyê li ser bingeha înkâr û îmhaya gelan hate avakirin. Di sed salên borî de jî ev pergala nijadperest hate meşandin û bû sedema gelek bobelatan. Di serî de gelê kurd, gelên kêmar, derdorên ji baweriyên cuda, çepgir, jin û demokratîk li derveyî pergala hatin hiştin. Ev wekî peyman û makezogona dewleta tirk a nepenî hate meşandin. Çand, gel, ziman, kom û rêxistinên li dijî vê pergala derketin rastî zilm, zordarî, komkujî û tevkujiyê hatin.

Têkoşina destanî

Tevahiya hêz û derfetên dewletê ji bo reng û dengên cuda li derveyî pergala, bê maf û azadî bîn hiştin, hatin bikaranîn. Pergala nijadperest û qirker di gelek aliyên de gihîşt armancên xwe û Tirkiye anî asta goristana gel, çand, ziman û baweriyên. Lê di mijarekê de têk çû. Ev jî mijara kurd û Kurdistanê bû. Tevgera Azadiya Kurdistanê li hemberî vê nijadperestiyê di her qadên jiyandê de û bi her rêbazan têkoşineke destanî meşandin.

Di encama têkoşina pêncî salî de hemû hesabên pergala nijadperest serobino bûn. Pevajoya tevkujiyê kurd vala derxist. Her wiha di encama bandora têkoşinê de nêrê qirkirinê ye li ser stûyê hemû gel, bawerî, çand û zimanên gelên din jî hate rawestandî. Têkoşina Tevgera Azadiyê ji hemû cudahiyan re bû nefes, hêz û bawerî. Niha hemû gel li ser bingeha têkoşinê vekirî hewl didin xwe pênasê û îfade bikin.

Ji bêderfetiyên derfet afirandin

Tevgera Azadiyê derfetên afirandin bi bindestan re parvekirin û xeta têkoşinê bi her awayî ve mezin kir. Li hemberî pergala faşîst hemû cudahiyan heyl anîn cem hev. Qasî ew kirin mitefîk, hevalabend û hêz, bixwe jî ew qas bi hêz bû. Ji bêhêziyê hêz, ji bêbaweriyê bawerî û ji bêderfetiyên derfet afirandin. Ji nîfşên wekî dijminê kurd û Kurdistanê hatine mezinkirin, perwerdekirin, kesayetên di rîya azadiya gelê kurd û Kurdistanê de şehîd dikevin derxistin holê.



Qasî pira di navbera gelan, bawerî, çand û ziman de ava kir, ew qas polîtîkayên komkujî, tevkujî û tunekirinê yê pergala nijadperest parçe parçe kirin. Qasî polîtîkayên pergala parçe bûn, ew qas hêza Tevgera Azadiyê û hevalbendên wê mezin bû. Dostên kurdan zêde û dijminên wan kêmar bûn. Bê guman ev stratejî, polîtîka û xeta têkoşinê bi pirsgrêkê nebû. Gelek zehmetî hatin kişandin, bedel hatin dayîn.

Serî li şer didin

Ligel hemû zehmetiyên û bedelan jî îro encameke girîng derkete holê. Pergala faşîst a sed salan hate xitmandin. Êdî pergala nijadperest nikare gelê kurd û cudahiyan li Tirkiyê û bakurê Kurdistanê dijîn bi vî awayî di bin nêrê faşîzmê de bihêle. Ji bo wê di bîst salên dawiyê de hewl dide pergala restore bike û li ser piyan bihêle. Bi taybetî di van dehsalên dawiyê de ji bo pergala nijadperest biparêze serî li her cureyê şer dide.

Ji sala 2016'an heta niha hemû hêza xwe ji bo tunekirina Tevgera Azadiyê bi kar tîne. Ji ber ku dizane dinamik û pêşengiya têkoşina pergala nijadperest têk dibe, Tevgera Azadiyê ye. Ku Tevgera Azadiyê têk bibe dê bikaribe cardin nasnameya tirk-sunî-henîfî ya nijadperest restore bike û li ser piyan bihêle, cudahiyan hewl didin dengê xwe derbixin, doza maf û azadiyên xwe dikin, heta hateyê bifetîşîne.

Restorakirina pergala

Li ser piyan mayîna pergala faşîst a sed salên borî di asteke jor de girêdayî vê hilbijartinê ye. Di vî hilbijartinê de

faşîzma AKP-MHP'ê li ser piyan bimîne dê hewl bide ku pergala sed salê pêşiya me jî li ser îmhaya û înkara gelê kurd û cudahiyan restore bike. Lê têk biçe jî dê pêvajoyek nû ya îşakirina Tirkiyeyê û pergala wê dest pê bike.

Niha pergala hewl dide cardin cudahiyan li derveyî pêvajoya îşayê ya nû bihêle û Tevgera Azadiya Kurdistanê jî li ser ramanên Rêber Apo hewl dide destûr nede vê pergala nijadperest. Tevgera Azadiyê dixwaze hemû gel, bawerî, çand û zimanên vê erdnîgariyê li ser esasên wekhev bide rûniştandin û pêşeroja wan misoger bike.

Operasyonên şerê taybet

Ji bo gelên vî axê di sedsala pêşeya me de maf û azadiyên xwe bi dest bixin jî, pêwistî bi tifaqa wan heye. Tifaqa Ked û Azadiyê jî bingeh û şênberbûna vê pêvajoyê ye. Ramanên Rêber Apo biçûk û mezin hewl dide ku hemû cudahiyan bîne cem hev û bike hêz. Di vî alî de serkeftin û pêşketinên gelek girîng jî bi dest xistine. Ligel hemû zilm û zordariyê pergala nijadperest têk bir.

Ku îro pergala ketibe nav qeydanê, nikaribe xwe bi rê ve bibe û li dû restorasyonê nû be, ev encama paradîgmaya Rêber Apo û hêza meşandina wê Tevgera Azadiya Kurdistanê ye. Hemû destkeftiyên gelê kurd û gelên din jî encama vê keda têkoşina destanî ye. Tifaqa Ked û Azadiyê niha temsiliyeta vî hewldanê dibe.

Hin derdorê jî pergala nijadperest a tirk bêxêber, di nav fikrên xwe yê paşverû de fetîşî, ji bilî çend gotinên li ser ser medyaya sanal bêhêz û mecal; li

dijî Tifaqa Ked û Azadiyê radibin. Pergala nijadperest jî, ji ber ku vî tifaqê weke talûkeyeke mezin dibîne, bi her awayî ve êrîş dike, operasyonên şerê taybet û psikolojîk pêk tîne. Ev derdorên di hiş û ramanê de hevkarên dewleta tirk in jî tev li van operasyonan dibin.

Pêwistiya stratejiya tifaqê

Pergala nijadperest û hevkarên wan ên qaşo kurd dixwazin Tifaqa Ked û Azadiyê belav bikin. Kurdan tenê bihêlin, dostên wan kêmar û dijminên wan zêde bikin. Di rojên pêş de jî çî qas hilbijartin nêz bibe ev operasyonê de zêde bibin. Lê çî dikin jî nikarin gelê kurd û derdorên demokratîk û bindest ji raman û projeya Rêber Apo dûr bixin. Raman û stratejiya Rêber Apo her roj zêdetir mezin dibe û ji hêla gelan ve tê ecibandin.

Bê guman hemû derdorên pê re tifaqê tê kirin, bi tevahî bi raman û stratejiya Rêber Apo serwest nîn in. Şêlûti û dubendiyên fikrî hene. Caran kêmasî û nebesiyên wan çê dibin. Lê ev nayê wateya ku stratejiya tifaqê û tifaqê pêwist nîn e. Heta êrîşên pergala nijadperest ên li dijî tifaqê girîngî û pêwistiya tifaqê zêdetir nîşan dide. HDP bi serê xwe nîşane û palpiştaya vî yekê ya herî berbiçav û şênber e.

Rêjaya dangan

Potansiyela Tifaqa Ked û Azadiyê niha li derdora jî sedî 25'ê dangan e. Rêjaya dangan jî niha li derdora jî sedî 16'an e. Ku kar û xebateke baş û rêxistinî, propagandayekê pozîtîf bê meşandin Tifaqa Ked û Azadiyê dê bibe parçeyekî girîng e ji nûve îşakirina pergala. Ev jî tê wateya

parastin û misogerkirina hemû mafên gelê kurd û bindestan. Tê wateya têk-birina rejîma faşîst a sed salên dawiyê. Faşîzm û hevkarên wan vî rastiyê baş dizane û operasyonên manipûlasyonê pêk tîne. Mixabin gelek kurdên niyet baş jî bêtî rastiya heyl baş fam bikin, bi bertek tevdigerin.

Nîqaşa demên dawî bi TÎP'ê re derketin holê ev rastî raxistin ber çavan. Mijarên weke, "TÎP dixwaze HDP li hind bajarên nekeve hilbijartinê, ji HDP'ê kontenjana wekîlan dixwaze" bi zanebûn hate mezinkirin. Gelek kesên niyet baş jî ev operasyon û manipûlasyonê weke rastiyekî girtin dest û bertek nîşan dan. Lê divê her kes bizanibe ku Tevgera Azadiya Kurdistanê tu mijaran demkurt nafikire.

Pêwist e her kes bawer be

Tevgera Azadiyê bi stratejiyeye demdirêj tevdigere. Dê hem bi stratejiya tifaqê xwe mezin bike û hem jî dê mafên gelê kurd heta dawiyê di asta herî jor de biparêze. Bi vî awayî dê destûr nede ku kurd weke berê bi tenê bimîne. Tevgera Azadiyê hemû bijartekana yek bi yek dinixîne û bijarteka di dawiya dawî de gelê kurd ber bi serkeftinê ve bibe, hilbijêr e.

Li ser vî bingehê pêwistî heye her kes feraseta Tevgera Azadiyê ya ev pêncî sal in li dijî çar dewletên dagirker li ber xwe dide, bawer be. Li dora vî stratejiyê bibe xelet û heta dawiyê têkoşina vî stratejî û ramana Rêber Apo bimeşîne. Weke her carê dê bê dîtî ku raman û stratejiya Rêber Apo çiqas hûr dinixîne, kûr dinixîne û dûr dibîne.

Aras Hiso

Li rojavayê Kurdistanê, piştî geşedanên çirûska şoreşê, ew agirê berxwedan, şehadet û wêrekiyê xwe berdida her malê û di her malekê de sembola ruhê neteweyî û xwînê li dar ket. Li her bajarekî bi awayekî êş û zehmetî kişandine. Carinan mirov ji xwe pirs dike "Ma qet ev bajarên te newestiyane? Şehîdên te êdî nayên hejmartin ku bi hezaran sûretên wan di malên te de daliqandî ne?"

Di her bajarekî de bi mehan şer, têkoşin û berxwedan lê rûdaye. Di sala 2018'an de gava ku grûpên çekdar ên ser bi Tirkiyeyê ve û dewleta dagirker a Tirkiyeyê êrîşî bajarê Efrînê kir, êrîşeke hov ku nayê aqlê mirovan anîn serê darên zeytûnan. Bi awayekî hov û dijimi-

Qîrîna jinên Efrînê

nane darên zeytûnan birîn.

Lê şervanên YPG'ê û YPJ'ê karibûn di heyameke 58 rojan de li ber xwe bidin û di ber ax û zeytûnên kesk de canê xwe bikin qurbanî. Hingê piştî berxwedaneke bênavber di dîroka 18'ê adara 2018'an de bajarê Efrînê ji aliyê dewleta tirk û çeteyên wê ve hate dagirkirin û bû sedema ku bi hezaran malbat dev ji warên xwe berdin û li bajarên din ên rojavayê Kurdistanê derbider bibin.

Hingê li vir gelek kurdên wêrek dev ji Efrînê bernedan û li ser axa xwe man. Çendî zehmet e ku li ser axa xwe bî û

bi şev û roj rastî talan û binpêkirinan werî? Wan malbatên kurd bi mebesta ku di mala xwe de, li ser axa xwe bişî, li cih û warên xwe man tevî vî yekê îro bi sedan belge didin diyarkirin ku çendî revandin, wêrankarî, kuştin û dizîn ji aliyê çeteyên ser bi Tirkiyayê ve tîne kirin.

Herî dawî jî di 20'ê adara 2023'yan de di şeva Newrozê de komek malbatên Cindîrêse ku dixwestin li ber mala xwe agirê Newrozê bikin, ji aliyê çekdarên Ehrar El-Şerqiye ve hatin êrîşkirin. Çekdarên Ehrar El-Şerqiye, di vî êrîşê de çar kesên jî malbatekê şehîd xistin

û çend kesên din birîndar kirin. Ev yek bû sedema ku kurdên Cindîrêse û yê herêmê biteqin û bi taybet jinên kurd. Gava ku me di dîmanan didît ku çendî wan jinan gurzên zeytûnê li eniya xwe digeran û bi dengêkî bi kerb û qîrîn di rûçikê gemara mirovahiyê de diqêriyan "Ji warê me derkevin, em azadiyê dixwazin".

Li aliyekî din gava ku rojnamegerekî dixwest bi dayikekê re bi zimanê erebî hevdîtinê bike. Wê bi kerb û bi êş digot "Ez bi erebî deng nakim û ez dev ji zimanê xwe bernadim. Ez dayika şehîdan im". Em niha fêhm dikin ku di ber parastina zimanê kurdî de çiqasî jinan karibû li ber xwe bide û çawa her tişt di ziman de kom dibin; çand, ax, wêrekî û hebên zeytûnan, hemû di hundirê

zimanê dayikê de dibin girêk û di rûçikê çeteyan de diteqe.

Tiliyeye dayika kezebşewitî bi ser kefenê kurê wê de ye û tiliyên wê yê serkeftinê jî li jor in. Eger kesek din bûya ji zû ve miribû lê ji ber ku dayika kurd e, ew her demê jîndar e. Dilê wê carinan kevir e, fişek e, darê berxwedanê ye ku pey serê dijmin dişikîne.

Wan bi xwe jî digot "Tenê dera ku agir lê radibe dişewite"; tenê xwediyê êşê bi êşê dizane û dîsa jî li hemberî van kiryarên dij-mirovahiyê bêdengî heye. Ger ne qêrîna wan jinan bûya belkî ev komkujî li ber deriyên û di quncik û qewêlan de bi dizî bihata vegotin û hinekan bigotana ev çirok rast bû ya ne rast bû. Tenê wan jinan bi qêrîna dengê xwe ji mirovajiyê re aşkera kirin bê rastî çî ye.

Şerê tirk û kurdan ê 1307 sal in ku berdewam e



Şoreş
Reşî

Piraniya mirovên ku ve sernivîsê û nivîsê bixwe bixwînin ê bi min bawer nekin ku şerêkî bi vî rengî, yanî 1307 sal in dewam dike, heye. Hinek dikarin bêjin ku 'tiştêkî wiha nîn e; em biran e û misilman in'. Lê kî çî dibêje bila bibêje, dîrok rastiya li ber me radixe. Pêwîst e em qertên di destên xwe de vekin, aşkera bînin ziman û kesek jî hewl nede ku hem xwe, hem jî kesên din bixapîne. Ji bo her kesî baştir e ku em rast bihizirin, rast binivîsînin û rast jî tevbigerin. Ji bo hinekan rastiya dîrokî dibe ku tîrş be lê lêkolîn didin xuyakirin ku 1307 sal in şerê tirk û kurdan berdewam e. Em ve yekê ji ku dizanin?

Helbet ev şerên bi tirkan re hatî kirin, di navbera her du gelan de dijminatîyek, bêbawerîyek bi xwe re anî û bû sedem ku kurdên li Xorasan belav bibin; pergala wan a zendî-êlî têk herê û ew bikevin bin desthilatdariyên din

çînî, li rojhilat kitan, li bakûr jî oxûz pir kuştin. Li ser kevîrê ji bo Bilgê Kaxan hatî daliqandî de ji bo oxûzan 'Sir Neh Oxûz' hatiyê nivîsandin. Wateya 'sir' tam nehatiyê fêhm kirin. Neh oxûzan di dewleta Gokturk û Üygûr de wek duyemîn hêz cih girtin. Üygûr û Oxûz ne qewmek e. "Di lîteratura dîroknivîsên tirk de heta piraniyên cihanê de peyva kurd derbas nabe; ew yek. Ya din, dîroka kurdan û tirkan hîna jî bi kûrahî nehatiyê lêkolînkirin. Lewra oxûz-turkmenê ku Sumer qal dike kurd bixwe ne! Di nivîsên pêş de ez ê li ser kurdûna wan binivîsim. Di çend hevokên nivîskar dinivîsî de jî xûya dike ku nav an leqaba serokê wan Baz ê ku navekî kurdî ye û tê wateya çûk/balindê. Dîsa Neh oxûzên tîr qalkirin jî zend û êlên girêdayî Qereçoriyan in.

Helbet ev şerên bi tirkan re hatî kirin, di navbera her du gelan de dijminatîyek, bêbawerîyek bixwe re anî û bû sedem ku kurdên li Xorasan belav bibin; pergala wan a zendî-êlî têk herê û ew bikevin bin desthilatdariyên din. Piştî vî şerî jî Sûmer bi awayekî girtî nêzikatiya tirkan/selçûkiyan e kurdan bi wan hevokan tîne ziman: "Di serdema Alpaslan û Melîk-Şah de erkên girîng nedidan turkmenan; ew didan memlûkiyan û farisan lê ne turkmenan. Wezîr Nizam ûl-Mûlk ji sultan re dibêje 'turkmen pir in, wan xizmeta dewletê pir kirin, pir zahmet kişandin, di dewletê de mafê wan heye, wan medin xeyidandin, ji wan çend hezaran terbiyê bikin û weke Memlûkan texin xizmeta dewletê' lê ew dîtin û daxwaz ji alî rêvebirên selçûkî ve nayê pêjirandin." Ew roj ew roj e rêvebirên dewlatên tirk ji kurdan ditirse, wan nakin şîrîkê dewletê û bi awayekî layiqê biratiya têyî qalkirin nêzik nabin.

Li hember vî sistema selçûkiyan ku Înkara kurdan (ew weke oxûz û turk-



men bi nav dikin) dike, heta dixwaze ji holê rake, weke kolê û eskerên xwe bi kar bîne, yek ji hêza serdemê ya mezin Memlûkan sistemeke nermtir meşandiyê ku ji alî kurdan ve jî dihate qebûl kirin. Wê yekê Sumer (rûp:179): "Heta hakîmê Cizîrê û yên Sûriyê Zengî ji malbata tirk (hûn kurd bixwînin) Memlûkan bûn. Qewmeke şervan û pir bûn. Ji ber ve yekê ji Maverûn-nehre de bigire li Îranê, Anadolu û Sûriyeyê hêza duyemîn mezina dewletan bûn. Hêzeka tu car teva nedibû ya yedek bû" tîne ziman. Weke hatî nivîsandin, kurdên di şer de têkçûne û yekitiya xwe êlî windakirî, ji gola kurdan (Aral) bigire heta Şam û Kahîrê ji dewletên xelkê re bûne hêza eskerî û her tim ji bo wan xwîna xwe rijandine.

Ji aliyekî de jî bi awayekî ne kolektîf her tim xwestinê ji bindestiyê rizgar bibin, li hember fişarên dagirkeran serê xwe rakin, bi dîn û çanda xwe bijînin. Ve yekê em di serdema moxolan de jî dibînin. Dr Yaşar Demîr (Selçuklular, Mostar, Stenbol 2020, rûp:179) dibêje: "Turkmenê ji ber Moxolan hatine Anatoliyê herêm kirin nava kaoseka mezin. Dema selçûkiyan xwest ve yekê bi hişki biçewisînin serhildana Anatoliyê ya herî mezin derket. Kesekî bi navê Baba Ishaqê ku misilmantî nepêjirandî, bi turkmenê girêdayî xwe ve rêvebirîyê xweser pêk anî. Di sala 1240'an de serhildan bi xwîna hatê vemirandin lê selçûkî gelek zêfî ketibûn û bi

ser ve de moxolan bîryar da ku Anatoliyê dagir bikin." Rast e ku kurdên li Xorasanê bi êrişên Moxolan re hatin Anatoliyê. Bav Ishaqê ji êla şamî ku pîrekî kurmanç û qizilbaş bû, ji ber fişarên selçûkiyan ên siyasî, eskerî û dînî li dij wan serî hilda, sultan ji ber wan rêvî û selçûkî neçar man ku eskerên frenk bînin û serhildanê têk bibin. Îro jî bi heman navî li Xorasanê şamiyên kurmançaxêv hene û ew jî girêdayî zenda Qereçoriyan ên min qal kir. Piştî vî serhildanê, her du aliyên jî zirareke mezin ditin û dewleta selçûkî jî ket bin desthilatdariya moxolan.

Nava rûpelên dîrokê bi sedan serhildanên kurdan ên bi vî rengî tije ye û wan tu caran nexwestine di bin desthilatdariya xelkên din de bijînin. Ew di dema selçûkiyan, moxolan, ereban, osmaniyan de jî wiha bû. Lê rastiyêke din jî derdikevê holê ku dewletên serdest dema bi kurdan re nebin dost û wan nekin şîrîkê dewletê, bixwe jî rûyê rojê xweş nabînin, pêş nakevin û nabin dewletên di cihanê de rol dilîzin. Îro di komara Tirkiyeyê de jî kurd hêza herî mezin in û di damezirandina komarê de bedelê mezin danê. Di şerê Çeneqalê de, tenê ji gundê min ê ji 44 malan pêk dihatî 66 kes mirine; kalê min heft salan şer kiriyê. Heger em ve yekê li seranserî welat belav bikin wêneyekî sosoret wê derkevê holê. Li gorî hêza kurdan û bedelên wan dayî jî ew nabin xwedî

mafên însanî û şîrîkê vî dewletê.

Pir mixabin îro jî ferqa hişmendiyê dewletê ji ya Îl Tîrîş tune; ji bo wê jî şer, pevçûn û êş berdewam in; rojê bi dehan ocaxên keç û xortên ji her du aliyên tîr vemirandin. Heman tiştê di dirêjîya dîrokê de qewimî dubarê, dehbarê û sedbarê dibin. Rêvebirina her du gelên, li Anatoliyê û Kurdistanê hîna jî li ser mantiqê selçûkiyan dimeşe û polîtîka li gorî wê demê cih bi cih dibe. Encam çî ye, kî jî vî yekê bi qezenc e? Encam ew ê ku hem neteweya tirk û hem jî neteweya kurd zirareke mezin dibîne, keç û xortên her du aliyên xwîna xwe dirêjînin û kêda gelan ji bo şer tê xerc kirin. Sebeba ve yekê rêvebirên dewletê yên ji meselê re çareseriyeka mayinde nabînin in. Gelo heta kîngê kuştinê berdewam bike? Heta ku weke serdema moxolan welat ketê bin desthilatdariya hêzêke din?

Weke çavkaniyên osmaniyan jî tînin ziman, kurd mîlet û hêzêke mezin in. Kurdan 1307 salan li hemberî ve polîtakayê li berxwe dan û dikarin ew qas salên din jî liberxwe bin. Di ve yekê de bila şik û gumana kesî nebe. Rêvebirên dewletê jî pêwîst e êdî ji ve polîtaka ku hezaran salan encam je nehatî girtin, hêza gelan roj bi roj kêmtir dibe, nahele ku zarokên van jî mîna welatên lê şaristanî bi pêş ketî, di nava aştî, dewlemendî, bextewerî, hûner, refah û evîne de bijînin, berde.



Yek ji damezirênêre dîroka tirkan weke tê zanîn prof. Farûk Sumer e (Oxûzlar-Turkmenler; Stenbol 1999, rûp: 24); ew beşeke kurdan wek 'Oxûz û Turkmen' bi nav dike û di pirtûka xwe de dibêje: "Dema Îl Tîrîş Kaxanê tirk xwest ku dewleteka tirk damezirîne li hember xwe oxûzên bihêz dîtin. Bi wan re penc caran di salên 715-6 an de şer kir. Hikumdarê wan ê bi navê Baz Kaxan di şerê dawî de tîk çû, dewleta Oxûz jî holê rabû û ew ketin bin desthilatdariyê. Di sala 717'an de oxûzan xwe avêtin paş çiniyan. Îl-tîrîş bû kaxan bi şûndê li başûr



Mehmet
Akdoğan

Famkirina Newrozê sekin û helwesteke bêguman derdixe holê. Newroz bi hestên bêşik û bêguman tê pîrozkirin. Hestên dilzîz û lawazbuna hestên şolî zirarê dide wateya Newrozê. Dîrok şahidekî qahîm e ku di hemû şert û mercan de Newroz bê şik hatiye pîrozkirin. Bê şik pîrozkirina Newrozê bawerîya tekoşîna azadiyê ye. Bawerîkirin serkeftin bixwe ye.

Ji ber wê yekê em dikarin bibêjin, Newroz zayîneke nû ye, vejîne, xwebûn û hebûn e. Xusûsî û cewherê xwe ji demsala xwe digire ku ew jî bihar e. Bihar bi sê cemran weke sê hewldanan ji bin hikm û esareta demsaleke sar û cemedî derdikeve û azadiya xwezayî dest pê dike. Tu qeyd û bend, tu şert û merc nikarin hatina biharê û xwe nûkirina xwezayê bisekinînin. Bihar bê şik û bê guman bi hemû delalî, bi hemû reng û wateya xwe tê.

Newroz jî weke demsala xwe bi sê xusûsiyan derdikeve holê. Vînin, biryar, tekoşîn. Bi van her sê xusûsan li hemberî hemû zilm û zordanan, li hember

Newroz cejn e ne şîn e



hemû şevrêş û zilmatan, di hemû şert û mercan de, bi hemû reng û wateya xwe weke agirê azadiyê xwe gur kiriyê û ro-nahî daye civakê. Civak salê carekê xwe bi wî agirî nû dike. Biryar û soza pêşerojê azadtir dide û ji bo pîrozkirina wê rojê her sal berdêlên mezin dide. Lê

her berdêldayîn dibe sedemê gurkirin û geşkirina agirê Newrozê. Ji ber wê yekê berdêl û cangoriyên Newrozê pîvan û eyar dane pîrozkirina Newrozê. Wate û pîrozahiya Newrozê ji wan pîvanan tê. Ji bo wê yeke ye, li her derê, li her demê, di hemû şert û mercan de civakê

ew pîvan parastine û xwedî derketineke bêşik nîşan daye.

Dîroka Newrozê, paşeroj û pêşeroja Newrozê bi vî rengî ye û dê bi vî rengî be. Tu caran reşkirin, vemirandin û temirandin, kêmkirina govend, dirûşm û tilîliyan nebûye peyama Newrozê. Peyam û wateya Newrozê kifş û diyar e ku gurkirina agir, geşkirina tilîlî, dirûşm û govendan e. Rizgarbûna hestan û fikran ji şolîti û bêbiryarbuyîne ye.

Newroz ne şîn e. Ne taziye û behîne e. Newroz ne girîn e, ne axîn û nalîn e. Newroz xwe komkirin û bi rêxistinkirine, ji şîn û girî derketin e. Newroz li hember mirin û kuştinê, li hember wêran û talanê, rêxistina vîne ye, ya raperîn û berxwedanê ye, ya heyf, tol û hesab xwestinê ye. Heke biryara raperîne, berxwedan û hesabxwestinê hatibe dayîn divê agir gur be û Newroz bi hemû wate û xusûsiyetên xwe bête pîrozkirin.

Heke Helepce hebin divê Newroz jî hebin. Heke Dehaq û zaliman ji bo gelekî, qirkirin afirandibe, divê bi pênc roja şunde Kawa Newrozêkê bide afirandin. Heke daxwaza zaliman ew be ku me bi mirinê xelat bikin, Kawa jî dê me bi vejîn û jiyaneke nemir xelat bike. Newroz xelata Kawa ye ku em xwedî jiyana û azadiyê nemir in. Agirê Newrozê

pîvana azadî û jiyana me ya mayînde ye. Ji bo wê ye pîrozkirina Newrozê nemire. Nayê vemirandin û temirandin. Nayê reşkirin û tarîkirin. Nayê astengkirin û qedexekirin. Her sal bêhtir agirê Newrozê tê gurkirin û geşkirin.

Ji bo gelê kurd, Newroz cejneke neteweyî ye. Cejneke olî ye, cejneke çandî ye û cejneke şoreşger û tekoşîne ye. Her sal gele kurd, bi hemû derd û kulên xwe, hemû êş û janên xwe ve Newroza xwe li gorî wate û ruhê wê pîroz dike. Bi cil û bergên neteweyî, bi govend û dîlanên ji hêrsê dagirtî, bi sitran û awazên biwate li dor agirê Newrozê, agirê azadiyê peyama xwe ya neteweyî dide dost û dijminan. Bê şik û bê guman dê Newroza îsal jî bi peyamên xwe yên bicoş û geşîya xwe bi vî rengî derbas bû. Li dijî ku tecrîd û hewldanên tunekirinê peyamên xurt hatin dayîn. Newrozê jî bo peyamên hilbijartinê jî hêvî geş kirin. Birîrên Helepce û Gurgumê hê germ in û Newroza îsal ew jî ji bîr nekin, weke xalê sereke cih dayê. Ji bo bîranînen wan, ji bo xeyalên wan ew careke din hatin platformên Newrozê. Ji bo ku heyf, tola wan li erdê nemîne, ji bo ku Dehaq bê hesab nemînin, gel bi çoş meşîya qada Newrozê. Hê em di nav çoşa Newrozê de ne. Newroz pîroz be.

Şar êdî azadîye wazeno

Şaro kurd emser xeylêk bajarên Tirkîya û Kurdistanî de bi coşî tewrê bimbarekkerdişê Newroze bî. Wan, Erzîrom, Qers, Êlih, Şirnex, Colemêrg, Stenbol, Amed û bajarên bînan de vayê azadîye ameyêne

Merkezê Xeberan

Şarê kurdî bi hawayêkê girseyî waranê Newroze de cayê xo girewt û reyna seba azadîye veng da. Xeylêk bajarên Bakurê Kurdistanî û Tirkîya de îradeyê aştiye û xoserîye peyda bî. Hukmato tirk vera nê îradeyî neçar mend.

Emser zanîyeno ke Kurdistan de di erdlêzê girdî qewimîyayî. Erdlerzê Mereşî xeylê xemgînerdox biyî. Şaro kurd o ke binê zulmê dewleta tirke de ciwîyeno nê erdlêzê de zî bêwayîr mend. Ci rê hetkarîye wextê xo de nêamebî. Bi hezaran kesan dinyaya xo bedilnaye. Nê semedî ra bimbarekkerdişanê Newroze de şayîye çin biye. La waştîşê azadîye estbî. Çimanê doman, kokim û cinîyan de ruhê paştîdayîşî estbî. Çarçewa weçînayîşî û bedîlayîşî de hêvîyêka girde estbî.

Şarî peygoşîye nêkerde

Bêguman Newroza Amedî her serre bala kurdan û dormeyanê demokrati-kan anjena. Her cayê Kurdistan û Tirkîya ra tewrbîyayîş beno. Goreyê ser- ra verêne emser eleqedarbîyayîş tenê kêm bî. Wina aseno ke erdlêzî tesîr kerdo. Şar hema dejê bêtere anjeno û xemgîniya xorîne de yo. Baxusus hetê psikolojî ra probleman ciwîyeno. Hema zî peyerdlerzî qewimîyênê û bînayî lerzenê. La şarî rixmê her negatîfîyan derheqê Newroze de peygoşîye nêkerde.

Rayber Abdullah Ocalan

Na Newroze de mîyanê şarî de vera Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî eleqeyo taybet estbî. Bitaybetî ciwanan portreyê Ocalanî kirîştene û seba azadîya ey veng dewleta tirke kerdene. Înan qêrayêne ke semedê çareserîya persa kurde muxatabêk Rayber Abdullah Ocalan o. Her bajar de no

îrade eşkera bî. Êdî şaro kurd wazeno ke persa kurde bi mabênkarîya Îmraliyê bêra çareserkerdene. Şar êdî wazeno ke serê erdê xo de azad biciwîyo; aştiye, aramiye û xoserîye awan bikero. Şaro kurd baş zano ke eke azadîye çin a, xelisîyayîşê kultur, nasname û ziwanî zî çin o.

Resimê Kemal Kurkutî

Newroza Amedî de şarî reyna nameyê Kemal Kurkutî ard vîrî. Xora rasteyê bimbarekkerdişî de resimê Kurkutî amebî kirîştene. Têkoşîn û zerreciheskerdişê Kurkutî zerrîya şarê kurdî

de wayîrê cayêkê erjeyayî yo. Zanîyeno ke Kurkutî 21ê adara 2017î de wareyê Newroze de bi destê polîsanê tirkan ame qetilkerdene. Gama ke polîsî pana Kurkutî ser, muxabîrê Ajansê Xeberanê Dîcleyî (DÎHA) rojnameger Abdurrahman Gokî fotografi antî. Nê fotografan rîyê dewleta tirke yo rast peyda kerd. Heta ke fotografi eşkera nêbîyî, kiştixan qetilkerdîş înkâr kerd. Tewr zîyade Walîtîya Amedî paştî daye kiştixan. Yew zî hukmê tirkî vera rojnameger Abdurrahman Gokî dewa akerde.

Kurkut Meletî de amebî dinya û Unîversîteya Înonu de wendêne.

Jîna Mahsa Amîni

Rasteyê Newroze de resimê Jîna Mahsa Amîni zî bale antêne. Cinîyan, camêrdan û domanan verê resimê aye de bi rêzdarî fotografi antêne. Nameyê aye Rojhelatê Kurdistanî û Îran de sembolê xoverdayîşî bî. Zanîyeno ke Jîna Amîni 16ê êlula 2022î de hetê polîsê Îranî ra amebî qetilkerdene. Nê qetlîyamî ra tepîya Îran û Rojhelatê Kurdistanî de vera rejîmê mollayan xoverdayîşê tesîrdarî dest pê kerd. Hema zî ruhê xoverdayîşî xeylêk şarîstanan de gandar o. Newroza Amedî de xoverdayîş reyna ame silamkerdene.



Meral Ozel

Her wext weçînitîsî muhîm biyê. Hama emser jedena muhîm î. Şarî verra faşîzmî besekene nî weçînitîsan de biresê serkewtişê pîlî. Weçînitîsê 14ê Gulanê rê zaf wext nêmend. Nî weçînitîsî serva şaranê Vakûrê Kurdistan û Tirkîya, taybet ke serva kurdan, cenîyan, gencan, lewîyan zaf muhîm î. Seserra Peymana Lozanî ya ke heqê kurdan kerdî têsêr û têbin ra kî nejdî bena. Seweta na peymanê tol vetene ke nî weçînitîsî muhîm î. Verra qirkerdene, talan, zorvajîye, politikayanê lejî yê hukumatî qomo cevabê xo bido.

Weçînitîsê serokkomariye, naye ra tepîya ciwîyayîsode senên qom pîno eskera bikero. Qerar û îradeyê şarî yo zaf çî bivurno. Kurdî bi reyanê xo besekene virnîya dîktatoriye bicêrî. Hetê ra bi riznayena bendî, na rey besekene jedena parlamentaranê xo meclîs de ca bikerî, hetê bîni ra kî na dîktatoriya ewroyîne besekene bireznê.

Kurdî, cenî, gencî û kes ê ke hetê na rejîme ra rastê zorvajîye yeno, kamîya xo nêna naskerdene, qesê xo nêno goscare kerdene 14ê Gulane de besekene peynîya nê îktidarî biyarê.

Tewr jede kî cenî yê ke meydanan bi serran o verra hêrişanê AKP-MHPyî tol nêverdanê û her ca de erzenê xo ver, nî weçînitîsan de wayîrê qese yî. Rejîma AKPyî Peymana Estemolî ra peyser oncîye, verra zorvajîya ser cenîyan tewa nêkerd, virnîya kistena cenîyan kerd ra. Her serre vînenîme

Textê sima rijîno

çitur heqanê cenîyan cênê binê lîngan. 25ê Teşrîna Peyêne de, 8ê Adare de çitur hêrişê cenîyan kenê. Dismenîya verra cenîyan nî rozan de jedena verê çiman der a. Na rejîme wazena cenîyan hepsê mavênê çor desan bikero. Waxto ke cenî tekoşîn danê jedena qarîrê. Cenî ya ke bêveng a, cenî ya ke qeseya camêrdan ra nêvejîna wazenê. Bingeyê politikayanê xo de bêkamî kerdena cenîyan esta. Coka qerarê cenîyan, serkewtişêde pîlî ke biyaro. Cenî verra hişmendîya camêrd-dewlete bi vatişê xo yê rengê nî weçînitîsan kî tayîn bikero.

Onca gencî yê ke hetê îktidarî ra nêna naskerdene, bi reyanê xo besekene virnîya ciwîyayîsî de newe rakerî. Cenî û gencî besekene bi reyanê xo textê hukumdaran bireznê.

Serva şaran 14e Gulane teyna qezançkerdene weçînitîsî nîya. Jûbîyayene, verra zilm û zorvajîye, faşîzmî jûbînî rê poştvejîyayene, weşiyade têdûste, ciwîyayîsêde neweyî ronayene ya. Yena manaya haqanê pêro dormeyan naskerdene. Nê weçînitîsî de sîstema faşîst û qirkerdoxe ya gonî vîndî bikero.

Îtîfaqê Kede û Demokrasî, yanî raya hîrêyine serva şaran, cenîyan, gencan, karkeran, dewizan, domanan weşîya têdûste de qerarîya xo çond reyî arde

ziwan. Raya pêroyîni de bare kerd.

Taybet ke erdlêzî ra dima ke qom zî verra politikayanê AKP-MHPyî her ca de hersê xo ano zon. Jûbîn rê wayîr vejîyayî. Na jûbîyayene besekene weçînitîsan de kî bimusnê. Terso ke AKP-MHPyî zerrê homete de vila kerd, axme bî. Merdene ra qeyir tewa çin o. Vesanîye ra qeyir tewa çin o. Nêverdanê kes fekê xo rakero, jû çekû biyaro ziwan. Desinde bi pêguretena tersnenê ya kî desinde cênê pê. Endî çila xelesîyayîşî vesena. Raya xo na sîsteme ra xelesnayene zelal a.

Xo ra pers bikerîme, eke kurdî,

dormê yê ke xo şoreşger name kenê, dormeyê demokrati nê weçînitîsî ra bi serkewtişî nêvejîyayî se beno?

Tewr sîfte na rejîme seweta kokê kurdan ardene, pêro rayan û qeweta xo ya hêriş bikero. Qirkerdena kurdan bibo karê bingeyî yê faşîzmî.

Cenî û gencî yê naye ra tepîya binê destê na hukumdarîye de pûç bibê.

Karkerî yê jedena bibê koleyê na sîsteme. Coka roz roza xelesîyayîs a. Roz roza xo ver esten a. Roz verra zilm û zorvajîye têhetameyen a. Xo vîr ra mekerîmê, nî weçînitîsan de kes o ke nê hukumatî ra bêzar biyo, kes o ke weşîye ra heta perwerdeyê têdûstî û aştiye wazeno eke reyanê xo rê wayîr vejîno, besekene bi yew reya virnîya qirkerdene kî bicêro. Rejîma faşîste ra bixeleşîyo.



Kayî seni do bêrê viraştene?

Valêre

6ê Sibate de merkezê ci qezaya Pazarxî ya Mereşî de 2 erdlêzê girdî qewimîyayî. Erdlerzan 11 bajaran de xesarê girdî viraştî. Hema hema Mereş, Hatay û Semsûr ê ke erdlêzî ra tewr zêde tesîr bibî de awanî nêmend. Ekîbê xelisnayîşî yê ke erê şîyî herême, tabloya ke dîye vera mat mendî û kêmanîya ekîpmanan vera dest nêda xeylê xirban. Şar binê xirban de ganî ganî merd. Goreyê dayeyanê fermîyan teqrîben 50 hezaran kesan erdlêzî de dinyaya xo bedilnaye. Derheqê vînbîyayeyanê erdlêzî de zî tu eşkerayîyêke nîna dayene.

Badê Mereşî 20ê sibate de bajarê Hatayî de têdima di erdlêzî qewimîyayî. Rîyê erdlêzî ra awanîyê ke xesar girewtbî zî rijîyayî. Bobelatê erdlêzî ra laserî de bêixmalîya dewlete reyna vejîyaye raşte. Êkîbê xelisnayîşî erê şîyî herême û hema zî hemwelatîjanê ke hetkarî nêgirewte estê. Şehmus Kurt (58) o ke nêweşîya kanserî ci de estbî rê hetkarîya xeyme nêdîyaye û mecbur mend ke tewrê keyeyê xo axur de bimano. Kurt o ke taxa Haltanlı ya qezaya Islahiye ya Dîlokî de cuyayêne enfeksiyon girewt û 14ê adare de dinyaya xo bedilnaye. Tepîştayo bi nameyê Îlyas Doganî ke erdlêzê Mereşî de keyeyê xo vîni kerd, waşt ke cezaya ci bêro taloqkerdiş û şero verê waya xo ya ke tena erdlêzî de weş xelesîyaya. Erdlerzan de hîkayeyê winasî vejîyayî raşte ke êdî merdim nêeşkeno tehemmulê îqtidarê îxmalkarî bikero ke nê mergan de qet para xo nêvînenno.

Dek û dolabê îqtidarî

Erdlerzo ke sey felaketa seserre ame binamekerdene de hema mexdurîyet nêamebî derbazkerdene, îqtidar kewt etîrê weçînayîşî û xebatî dayî destpêkerdene. Na dewlete herinda ke dejê hemwelatîjanê xo bipişna û înan het de biba, nika weçînayîşî nîqaş kena ke do na reye dek û dolabanê senîyan ser bikewa.

Dewlete hetkarî nêkena

Vîzêr kanalê televizyonêkî de yew bername estbî û ewja de ame vatene ke dewletê hemdemî wextê korona de bi helîkopteran pere û hetkarî ronayî balkonanê hemwelatîjanê xo, la Tirkîya de heta ke zanayîşê kokê merdimî daxî nêrî girewtene û kontrolê hemwelatîjî nêeşkenê tu hetkarîyêke bigêrî. Dewlete hetkarîya hemwelatîjanê xo nêkena. No mird nêkeno, pereyê ke kampanyayan û bacê depremî ra arê dîyayî zî kena xezîneya xo û pereyê şarî yê ke seba roja xirabe arê dîyabî, seba îqtidarî yenê xerkerdiş ya zî şinê kasaya înan.

17ê tebaxa 1999î de serê xeta Kocaelî, Golcuk û Yalovaye de girdîya ci 7,4î de erdlêz qewimîya û nîzdîyê 20 hezaran kesan nê erdlêzî de dinyaya xo bedilnaye. Mexdurîyêtê ke o wext vejîyayî raşte nika hîna giran vejîyênê raşte. Yanî yeno na mana ke nê welatî aye wextî ra heta nika tu gamêke nêeşta û aver nêşîyo.



Fatma Taşlı Tunç

Osmanê Mahmê û Rebîhanê

Rebîhanê hevîna Osman bû û dikana wê ya beqaliyê hebû li ber dikanê bû.

Osman ereba wî û hespekî wî hebû, dixebitand, wê demê erebe û hespekî kê heba weke qamyonê wan hebe.

Ê Osmanê Mahmê, hem hesp û erebe û hem jî dikana beqaliyê hebû, ê mîr û axa ew bû.

Rebîhanê li ber dikanê bû. Dikan jî çî dikan! Çend kevir bi heriyê dabûn ser hev çadirek kişandibûn ser, deriyek ji textika li ber xistibûn weke feqa gura.

Çend karton biskuwît torbyek şekir, yek birinc, çend qalib sabûn, çewalek kartol.

Bi sedan mişk û bi milyona mêş.

Gelê taxê tev xizan bûn, ji boyî Rebîhanê bi deyn qalibek sabûn an jî kiloyek şekir bide wan, bi seatan pesnê wê û Osman û dikana wan didan.

Dema bi deyn bida, Osman tiştê nemayî dianî serê wê, pê re şer dikir û jê re wiha digot:

- Keçê ez nabêjim bi deyn nede taxê. Tu didî paşê perê me nadin.

Rebîhan bê deng dima, dilê wê bi der û cîranê wê dişewitî, zanibû pere bi kesî re nîn e, gişt xizan in, zarokên wan li malê ji birçîna digirîn.

Lê kirînerên Rebîhanê ne hew gelên taxê bûn. Ji tevahî Kurdistan û Tirkiyeyê kirînerê Rebîhanê hebûn. Ji ber ku dikana wê di quncika zindana Amedê debû û dema ji bajarê dîr û nêz dihatin ji bo hevdiîna xizmên xwe, ji dikanê biskuwît helaw û nan dikirîn, piştî xwe didan diwarê hewşa zindanê û dixwarin, wan bi perê hazir dikirîn. Ji ber wê yekê, Osman nedixwest bi deyn bide cîranan.

Ez sibakê rabûm ku di hundir de zellaqe tune. Ne nan, ne şekir, ne çayê, ne rûn û ne tu tiştêkî din.

Min berê xwe da dikanê.

Rebîhanê li ber deriyê dikanê rûniştîye, destê wê li ber rûyê wê ye û diponîye. Min silav lê kir, bersiva min da. Ez nizanîm ku Osman xwe di dawîya dikanê de ye.

- Rebîhanê tu karî hinek zexîre bidî min bi deyn,? Weleh zarokên min di hundir de birçî ne. Kesî ku alîkariya min bike nîn e.

Rebîhanê ne axivî lê bi destan îşaretî min kir, wekî ku bibêje, tu çî dixwazî rahêjê. Dema min destê xwe avêt karyola da ku hilibijêrim. Ji nedîtî ve Osman şiv di destan de û hucûm bir Rebîhanê û ew da ber şivterkan.

Ronî di çavê min de nema, min delka xwe da Osman û min şiv ji destê wî girt û wiha got:

- De bila şiva te pê bive. De bila destê te pê bive? Ez ê wê şivê di serê te de bişkînim, de va ye min got! Dema min wer got, vekşiya li rûyê min nenêrî, çavê xwe bera erdê da û got.

Çî îşê te jê ye diya min? Ez li jina xwe dixim. Hûn bûne mêrê, mêrê xwe, hûn dikin jina min jî bikin weke xwe?

Ez hatim malê û ez êdî hew çûn dikana Rebîhanê. Di ser de sal derbasbûn, Zarûzêç tev mezin bûn, Osman û Rebîhanê mala xwe birin Îzmirê, di ser de sîh sal bihurîn. Rojêkê ez li kolanê rastî Rebîhanê hatim- Lêlê Rebîhan, tu û van deran? hey bê miradê...

Min nedî çawa hêsirê wê hatin xwarê. - Erê lêê êê. Osman mir. Min kurê xwe Hemed zewicand. Lawikekî Hemed çêbû,

min navê Osman hilanî. Ew rojên berê tev di ber çavê min re derbas bûn. Min got:


- Te çîma navê Osman lê kir?

Ma qey nav nemabûn li dinê?

Tiştanok (mamik)

Gelî hêjayan mamik an jî tiştanok çandekê kevnar a gelê kurd e û berê di civat û şevbêrkên xwe de mamik ji hev dipirsîn. Me dîsa ji we re çend tiştanok anku mamikên xweş amade kirine. Em hêvî dikin ku bi dilê we be.

- 1-Mamê mino** Ew çî ye?
Bîrek e **2- Mamê mino**
Ser birê re girek e Bûk li hundir e
Serê gir du kanî ne Porê wê li der e
Ser kaniyan çayir e De bêje ew çî ye?



Bersivên me ev in:

1 - Devpoz, çav û por 2 - Garîs

Biryara dadgehê


Hesen Hemkê

Li daristanekê îlana karê 'Kivroşkeke ku bikaribe tûnelan keşif bike' hate dayîn. Rabû beriya kivroşkan hirçekî bê kar çû kaxizên xwe pêşkêş kir. Piştî ku hirç kaxizên xwe temam kirin ew kar bû nesîbê wî. Piştî demêkê hirçê dît ku wa ye kivroşkek di wezîfeya 'Hirçê ku rîyan vedike' dixebite, hirçê dît ku meaşê distîne jî gelekî zêde ye lewre xwest ku ew biçe wî karî bike. Hirçê li ba rêveberiya giştî ya daristanê gilî kir û lijnayek ji pilingan dadgeriya vê dozê kir.

Dadgeran (Pilingan) bang li hirç û kivroşkê kir û her duyan ewraqê xwe pêşkêşî dadgehê kirin. Hemû ewraqên hirçê teqez dikin ku ew kivroşke û hemû kaxizên kivroşkê jî teqez dikin ku ew hirçe. Dadgehê biryara xwe da û got her yek ji we wezîfeya xwe ya berê dewam bike. Hirç ji dadgehê derket û li ser vê mijarê diponîjî. Parêzerekî ji hirçê pirsî û got te çîma ew biryara pilingan itiraz nekir. Hirçê got ma ez ê itiraza çî bikim, ez dizanim ku ew tev ker in ne piling in lê hemû kaxizên wan keran îspat dikin ku ew piling in ez ê çî bi wan bidim qebûlîkirin.



XAÇEPIRS



JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ VE

3 - Dayik 5 - Cihê ku genim lê tê hêran 7 - Koma pez 8 - Ox, nîşaneyê acizbûnê 9 - Pepûk, belengaz 13 - Komike ziman ya ku erebî jî di nav de ye 14 - Ne bejî 16 - Tewaş, nîvişk 19 - kulbûna laş 20 - Agir 21 - Ne ziwa, hêwî 22 - Roj 25 - Ji bo, daçekek 26 - Gotineke ji bo pesindanê tê bikaranîn 28 - Sembola berxwedana Efrînê

JI JOR BER BI JÊR VE

- 1 - Felaket, wêranî
2 - Cihê asê yê ku berê ji bo parastinê dihatin avakirin
3 - Sewaleke ku ji bo goşt û hiriya wê tê xwedîkirin
4 - Zebeşê ku negihîştibe, hiundirê wî spî be
6 - Bajarekî rojavayê Kurdistan
10 - Ji ta qalintir ji werîs ziravtir
11 - Debirîna fikir û ramanekê
12 - Genimê ku dikeve nava mehîrê
15 - Bajarekî bakurê Kurdistanê ye
17 - Erê, bersiva erênî
18 - Alaveke muzîkê ya kevin
20 - Meheke biharê
23 - Îrade
24 - Ajanseke nûçeyan ya biyanî
27 - Kar û xebat

Bersiva hefteya borî



Gerok Ma derûniya zarokên erdhejzede aş dike

Şêrko Kanîwar, diyar kir ku ji bo zarokên erdhejzede çûne herêmê û got ku ew hewl didin xwe bigihînin hemû herêmên erdhej lê qewimiye, li gund û bajaran bigerin, xwe bigihînin zarokên welêt û bi wan re pêvajoyeke baş derbas bikin

Yaşar Eroglu

Gerok Ma xebatên xwe yê di çarçoveya erhejê de didomîne. Piştî ku huner-mendên Ma Musîcê çûn alîkariya herêma erdhejê û vegeyriyan huner-mendên vê qadê ji bo zarokên herêmê yê erdhejzede yan trawmayên erdhejê nejn û sivik derbas bikin gereke hunerî li herêma erdhejê pêk anî. Rojnameya me Xwebûn di çarçoveya vê gerê de bi berpirsiya û mamosteyê Koma Ma Musîcê Şêrko Kanîwar re der barê gerê û xebatên xwe yê herêma erdhejê de axivî.

Şêrko Kanîwar li ser gera wan li herêmê agahî dan. Kanîwar di serî de der barê Gerok Ma û mebesta gerê de axivî û wiha got: “Gerok Ma weke ku navê wê jî xuya ye; wateya wê ‘em ên gerok’ e. Ma wê derê zazakî ye. Yanî wateya wê ‘em ê ku digerin’. Em ji bo çî digerin? Ji bo ku xwe li hemû herêmên erdhej lê qewimiye, li gundan, li taxan, li bajaran, li navçeyan xwe bigihînin zarokên welêt û bi wan re ji bo pêvajoyeke baş derbas bikin. Piştî erdhejê, mirov dikare bêje ger ku bandora erdhejê rewşeke trawmatîk ser wan çêkiribe, hem wê hêsan derbas bikin û ger ku jixwe zarok xwe jî trawmatîze nebûbûn jî-kî piraniya zaroka trawmatîze nabin, li gorî îstatîstîkan bûyerên bi vî rengî sedf bîst li ser zarokan bandoke pir neyînî li wan çêdibe- karî bin atolyeyên hunerê, bi kargehên hunerê jiyana normal a rojane ya zarokatîyê berdewam bikin.”

Bi awayekî mobil geriyar

Şêrko Kanîwar axaftina xwe wiha dewam kir: “Û çima bi awayekî gerok?

Bi awayekî mobil em divê bigerin, ne sabit bin cihekî? Li gelek bajaran erdhej çêbûye, bi awayekî sabit xwegihandina hemû zarokên erhejê ne pêkan e. Lê awayê Gerok wê çawa be? Wê hewl bide di nava du salan de xwe bigihîne gundan, navçeyan, bajaran; bi taybet weke min got wê li gundan bigere. Di destpêka yekemîn a erdhejê heta niha xebatên hunerî, xebatên bi zarokan re tên kirin piranî yan li navçeyan an li bajaran kom dibin. Bê guman sazî û dezgeh û aktîvistên bi zarokan re dixebitin yê ku xwe digihnin gundan hene mirov dikare bêje ew qas kê m in, di asta tunebûnê de ne. Îja ji ber wê Gerok Ma bi otobusan; bi otobusên hatine dîzaynkirin weke poleke hunerê, weke saziyêke hunerê wê gund bi gund, navçe navçe bigere, bernamêyekê derxe û planeke şênber a du salan daye ber xwe.”

Mamoste û berpirsiyarê Koma Ma Musîcê Şêrko Kanîwar der barê kes û saziyên beşdarî vê organîzasyonê dibin de ev agahî dan û got: “Gerok Ma bi kê pêk tê? Bi koordînasyona pêşengtiya komeleya Ma Musîcê û Zarok Mayê de sazya me ya li Amedê KASED, Komeleya Dicle û Firatê û her wiha komeleya Rojhilata Navîn a Sînemayê, Şanoya Bajêr a Amedê û dîsa li Wanê saziya me ya ŞanoWan, Aryen Huner, li Stenbolê Navenda Çanda Mezopotamyayê, li Qoserê Mezopotamya Huner; bi hevkarîya van sazî û dezgehên çand û hunerê yê min qala wan kir, navên wan jimart.”

Cur bi cur kargeh hene

Kanîwar diyar kir ku cur bi cur kargehên hunerê wê pêk bèn û axaftina

xwe domand: “Her car wê bi pêşengtiya van saziyan wê bernamê bê derxistin. Di berameyan de wê çî hebin? Kargehên muzîkê, kargehên rîtmê, kargehên stranbêjiyê, kargehên ku em jê re dibêjin bi alav û amûrên rengîn xebatên muzîkê û performansên zarokan, her wiha kargehên boyaxkirinê, kargehên psîko civakî yê zarokan, lîstikên dramayê, film temaşekirin û her wiha bi komên şanoya zarokan, palyaçoyên sînornenas rexebatên dramayê, xebatên şanoyê. Ne tenê ev sazî û dezgehên min jimart, Gerok Ma wê hemû sazî û gezgehên zarokan ên hunerî re vekirî be. Gerok Ma wê hemû aktîvistên bi zarokan re xebatên hunerî dikin re wê vekirî be.”

Ji Bazarcixê heta Nûrdagê

Şêrko Kanîwar dîsa li ser bernamêyan sekinî wiha derbir: “Gerok Ma wê her car mehane, carinan sê mehane wê bernamêya xwe ya şênber derxe. Wê xwe bigihîne zarokên welêt ên erdhejê. Gerok Ma bi vê mebestê ava bû, bernamêya xwe ya yekem jî 8’ê adarê de dest bi gera xwe ya yekem kir. 20 kesên ku ji navenda çandê ya KASED’ê û komeya Rojhilata Navîn a Sînemayê û perwerdekarên Ma Musîcê pêk dihat, bi beşên xwe yê muzîk û her wiha beşên xwe yê hunerê dîtbarî, wênexêziyê, boyaxkirinê, dîsa komele Rojhilata Navîn a filmtemaşekirinê ji bo belgekirina vê xwebata em ekîbek di 8’ê adarê de derketin, me berê xwe da Bazarcixê; em li Bazarcixê li gundan geriyar, gundên ku me di xebata berê di fîzîbîlîteyê de tesbît kiribûn, em li wan gundan geriyar”.

Mamosteyê Ma Musîcê û organî-

zatorê Gereok Mayê Kanîwar wiha dewam kir: “Ev kargehên me di serî de jimartin, ev kargeh hemû li van gundan pêk hatin. Bi qasî plana ku me dabû ber xwe me li Bazarcixê gihand 5 gundan, piştê me berê xwe da Nûrdaga Dîlokê. Li Dîlokê li sê gundan me xebat meşand. Dîsa di çarçoveya kargehên min jimartin. Bi tamamî em gihiştin 191 zarokên temenên wan di navbera 2 û 3 salan de dihat guhertin. Eleqeyêke pir mezin hebû ji hêla zarokan ve. Eleqeyê mezin ji zarokan bêtir ji aliyê şênîyên gund hebû. Gelek kargehan ew jî tev lê bûn, bi zarokên xwe re”.

Baranê rê neda dewam bikin

Kanîwar zehmetiyên derketine pêş wan û ferz kiriyê ew vegeyriyan jî wiha anî ziman: “Û çima vegeyriyan? Ji ber ku baran barî, rewşa hewayê qet ne baş bû. Jixwe vegeyriya me di çapemeniyê de jî weke me hemûyan dît. Gelek herêmên di konan de diman, kon di bin avê de man, kon li avê çûn, li ber bê çûn. Derfetên ku mirov karîba kargeh çêbikirina tune bûn. Ji ber wê bernamêya me nîvco ma. Em plan dikin ku di hefteya yekem a nîsanê de vê plana nîvcomayî ya Gerok Mayê xwe bigihînin, em neçûn Islahiye, em dixwazin biçin Islahiye, Samandagi, Antakya, Îskenderûn û piştê jî em ê bernamêyekê ji bo Smsûrê, Meletyê derxin.”

Berpirsiyarê Ma Musîcê Şêrko Kanîwar der barê bernamêyên pêşerojê kir û wiha axaftina xwe bi dawî kir: “Weke min got, Gerok Ma wê du salan carinan bernamêyên mehane,

carinan heftane, carina sê mehane yê şênber hem bi pêşengtiya van sazî û dezgehên çand û hunerê û hem jî wê bi beşdariya sazî û dezgehên hunerê yê bi zarokan re dixebitin, hem sazî û dezgehên herêmî hem sazî û dezgehên li Tirkiyeyê û navneteweyî dixebitin meha nîsanê hefteya yekem; ji ber ku navê komê niha ne diyar e berî ku em derkevin qadê wê zelal bibe em ê wî çaxî dîsa bikaribin bi we re parve bikin, komên biyanî ku ji wan re dibêjin palyaçoyên sînornenas, zarokan re êw ê jî li herêmên piştî felaketan, piştê erdhejan, piştî şer diqewimin bi zarokan re xebatan dimeşînin, komên bi vî rengî jî wê tev li me bibin. Hem sazî û dezgehên li herêmê dixebitin, hem sazî, dezgeh û aktîvistên li Tirkiyeyê, li welatên cur bi cur ên cîhanê dixebitin, Gerok Ma wê bibe qadeke hevpar a xebatê ji bo hemû kesên ku dixwazin xwe bigihînin zarokên welêt, zarokên herêmên erdhejê.”




Roza Metîna

Bi rêwîtiya lêgerîn û lêpîrsînê ya berhe-ma bi navê “Telebe” ya nivîskarê girtî Delîl Payîz re, reşikên çavên min ji ronahiyeke nû re vebûn. Bi mijar û peyama dihat dayin, têgehên kurdewarî û hunera şibandîne, têkiliyên sedem-encamê, fikra sereke, taybetmendiyên kesayetî û ruhî, ber bi asoya hizrê ve bi rê ketim. Bi raza çend bizotên di bin xweliyê de û dengê kevîrekî xweşik, bi van gotinên nivîskar dîsa bi per û bask bûm; “Kulîlkên dora bihivê hîn nû vedibûn. Ji dûr ve çilspî xuya dikirin. Mizgîniya biharê bûn ev kulîlk. Xilasbûna zivîstanê bûn. Mirina sar, seqem û qeşayê; vejîna xwezayêke germ û bişînkayî.”

Mijar û peyama tê dayin

Di hinek çîrokan de dema mirov tê dawiyê, mijarê û peyama tê dayin hîn nû ji kûr de fam dike. Ev jî rêbazeke din a nivîsandina çîrokê ye. Lê bi bandor e. Di hinek çîrokan Delîl Payîz de ev rêbaz hatibû bikaranîn. Li gorî min ev yek daxwaza xwendina çîrokê jî zêde dike. Teşeyekî cuda lê bar dike û hişyariyekê di mejî de dide avakirin. Carinan jî du hevokên dawiyê perdeya li ser wêneyê çîrokê dide alî. Di çîroka bi navê Aram a nivîskar de her du hevokên dawiyê wateya her du hevokên di serî de kifş dike. Di serî de wiha tê gotin: “Kî dibêje li Mêrdînê derya tune ye, Mêrdîn tev çol û deşt e? Kî? Ka bila gawekê derkeve pêş.” Dema çîrok ber bi dawîbûnê de diçe her du hevokên dawiyê wiha diherikin: “Dema hevalê Aram çavên xwe yê deryayî li jiyane girt deryaya Mêrdînê jî çîkiya ziwa bû. Niha

Rêwîtiya lêgerîn û lêpîrsînê



Mêrdîn bê derya ye.” Heta dawiya çîrokê meraqeq ji min re peyde bû. Meraqa deryayekê. Lê tu nabêjî0 ev deryaya di çavên Aram de dihat parastin, bi ruhekî zindî dengê pêlên xwe dida bihîstin.

Têgehên kurdewarî û şibandin

Hunera şibandîne û bikaranîna têgehên kurdewarî ya di berheman de mîna du stêrkên geş ên li asîmanê dil in. Di çîroka “Diya Min” a nivîskar de hem hunera şibandîne hatiye bikaranîn hem jî di nava wê hunerê de têgehên kurdewarî cihên xwe girtine. Bi van her du hevokên di berhema nivîskar de meseleya min xwest balê bikîşînin ser bêtir şênber dike: “Yên ku li reqoqa traqtorê siwar bûne baş dizanin çiqas dijwar e rûniştina reqomê. Weke dewê ku di hindurê meşkê de biçeliqe, em ji aliyekî difiriyar aliyê din.” Dewê di hindurê meşkê de di jiyana kurdan de xwedî cihekî girîng e.

Dew û meşk tama rûnê nivîşkê li ser dika gund bi bir tîne. Elbet bêtir a di zarokatîyê de. Her wiha çîroka “Diya Min” bi devê zarokekê/î hatiye honandin. Ev jî hesteke taybet dide avakirin.

Têkiliya sedem-encamê

Têkiliya sedem-encamê di hinek çîrokan ve berhemê de baş di mejiyê min de rûnişt. Her wiha nivîskar di çîrokan xwe de bêtir şêwazeke realist bi kar aniyê. Û berî daye wê kûrahiya derûnî jî. Bi peyamên di dawiya çîrokan xwe de, bi honandina bûyerê hêza aqilê xwe nîşan daye.

Fikra sereke ya berhemê

Di vê berhemê de fikra sereke têkoşîna di riya doza kurdariyê de ye. Nivîskar bi vê hevoka xwe cih daye berteka li dijî înkarkirina eslê xwe: “Dariusê ku eslê xwe înkâr kiribû, şer-

mezar kir.” Diyar e nivîskar li ser mijar û lihevkarîna çîrokan xwe jî baş kûr bûye. Têkiliyêke hêsan di navbera karakter, xwîner û peyama li ber çavan, hatiye avakirin. Dem û cihê bûyerê lê qewimiye bêtir bi awayekî rasteqîn û şênber xuya dike.

Taybetmediyên kesayetî û ruhî

Di berhema “Telebe” ya nivîskar de em li taybetmendiyêke xurt a kesayetî û ruhî ya lehengê çîrokê rast tên. Mirov bi van hevokên di çîrokê de di heman demê de ruhê azad ku ji rehma axa xwe nehatiye qutkirin, dibîne: “Dema bi pêgermok digeriya û xeyal dikir wê wextê ji nav dîwarê zindanê firar dikir. Diçû wargeheke ku jê hez dike, bi mirovên ku ji wan hez dikir re diaxivî, dikeniya...”

Rolên zayenda civakî

Di nixandinên xwe yê berê de jî min bal kişandibû ser rolên zayenda civakî. Ev mijareke girîng e û divê em tim bînin ser ziman. Di vê berhemê de jî dîsa çêkirin û amadekirina xwarinê para jinê ketiye. Di çîroka “Kevir” a nivîskar de bi vê hevokê em dikarin mînaka rola çêkirin û amadekirina xwarinê ya li jinê hatiye barkirin nîşan bidin: “Keçê rabe ji birê xwe re gezek nan amade bike!”

Dûrxistina ji ruhê ax û xwezayê

Kurd her tim bi hesreta ax û xwezaya xwe nalîyane. Ev nalîn çûye di ezmanan re derketiye. Bi vê hevoka di berhemê de ev nalîn di dil û mejî de zindî dibe: “Şewitandina gund ku yek kêliya wê ji bîra wî neçûbû wext bi wext di ber dil û çavên wî re derbas dikir.” Dîsa bi vê hevoka di ber-

hemê de jî li dijî zilm, zordestî, neheqî, polîtîkayên tunehesibandin û înkarkirînê kurd piştê xwe dispêrin ronahiya rojê: “Ne bav, ne dê, ne jî xwediye me heye. Tenê roj li me xwedî derketibû û dilê me yê sar germ kiribû.”


Doza birûmet

“Heta ku mal hemû şewitîn ve waweylêyê domand. Orînê û dengê heywanên ku bi saxî şewitîn hê jî di guhê Apê Ehmed de bû. “ Têkoşîna birûmet a gelê kurd a li hember vê zilmê û tunehesibandîne her tim dewam kiriyê. Bi vê hevoka di çîroka “Evîneke Porspî” de ev têkoşîna birûmet dîsa eşkere xuya dike: “Ji dêvla ku em ê bibin qoricî û kurtêlxur û li hemberî şervanên dilê xwe bi dijmin re hevkarîyê bikin, bila em bibin mitîrb û koçber hîn çêtir e.” Apê Ehmedê nebû cerdevan û jî gundê xwe bi zorê hat derxistin ji bo gundê xwe careke din bibîne diçe û li ser riya gund koça dawiyê dike. Gelek kurdên wiha birûmet di riya doza xwe de jiyana xwe ji dest dane.

Rêwîtiya lêgerîn û lêpîrsînê

Rêwîtiya lêgerîn û lêpîrsînê ya di nava berhemeke de yek ji armanca xwendinê ye. Ger ev rêwîti baş derbas bibe sudek baş jî tê wergirtin. Ez dikarim bêjim ji vê rêwîtiya lêgerîn û lêpîrsînê ya di berhema bi navê “Telebe” de min sûd wergirt. Di vê rêwîtiyê de carinan li Bekoyê Ewan rast hatim, carinan li dû meraqê gindor bûm, carinan jî di nava vê benda helbesta di çîroka “Dorevanê Agir” de dibûm çirûskeke ji agirê ber bi ezmên ve bilind dibû:

*di şevên çik sayî de
bû hevalbendê êgir
di agirê çavên wî de
laşê çaran dişewite
çardehê tîrhemê dihele*



Agîd
Yazar

Kristof K(urd)olomboyek li Kubayê^{IV}

Rêberê min Alfredo yê reşik, welatê xwe yê bêqisûr bi vegotîneke şehane bi me dide naskirin. Erebe ya me ya Chevrolet a modela xwe 1958 nola hêlekane di bin me de hêl dibe. Pêla bayê bax û baxçeyên fêkî û mîweyên tropîkal, hilme-gulmeke şêrîşimamokî bi xwe re tîne û li hev digobîlîne.

Li çîhekî nava bexçeyan em ji erebê peya dibin. Ez xwarve tîm, kulmek ax ji erdê hiltînim û di kulma destê xwe de difiridînim. Bimbarekê ne ax e, tu dibê qey hineya hindê ye. Ev axa weke ardê hêrayî, nola per û pîşo wanî hesteke nermehênîk li can û cesedê meriv belav dike. Çêja xwe tîrş e, tahl e, tûj e, zêr e û şîrîn e. Rengê xwe kesk e, sor e, zer e û rengîn e. Axax ax, dayika ax! Tu hem can î, hem reng î, hem jî hemû çêj î.

Anasên gihastî, nola teyrikên xerîb li ser tûmikê gihayê lûsyabin, wanî li ser tûmikê xwe venîştîbûn. Guliyên darên Mangoyê, di bin Mangoyên her yek bi qasî zirşimamokekê mezin de hatîbûn xwarê. Ji Avaqado bigire, heta gûza hindê û fikiya bi navê durian bigire heta yên wekî din, hezar û yek cure mîweyên tropîkal ên egzotîk li girava Kubayê çêdibin û dikemilînin. Hinek jê bi bêhna xwe, hinek bi rengê xwe û hinek jî bi dirûvê xwe dişibiyên berhemên bîstaneke li ber devê şetê Dîcleyê. Hinek, şimamok û zirşimamokên zer û sor in, hinek şelengo yên bi pirçîk in, hinek qitiyên kokel in, hinek gimdorên gurî wanê hingivî ne û hinek zebeş ên belek û dendik biyazî ne.

Alfredo her yek ji wan mîwe û fêkiyan yek bi yek dide naskirin. Heçî ez im, ez jî nola mîşhingivekê wan ê miqîm ji tam û bêhna wan a bihiştîyane hildimêjim.



Çaxa em zarok bûn, mezinan tepika xwe li serê me zarokan dixist û destê xwe bêhn dikir. Heke zarok ê malbateke xizan bûya, digot bêhna şorbê û pîvazê tê ji serê te û te ew xwariye. Heke zarok ê malbateke dewlemend bûya, digot bêhna goştê sêlê ji serê te û her wekî din. Vêca mesela min û rêber Alfredo ye. Ez dibêjim bêyî hinek tepa xwe li serê min bide, heta hetayê ew ê her bêhna van mîweyên tropîkal ji serê min ê xwediyê devekî çilek e, bîn.

Ne tenê fêkî û mîwe, baxû bexçê û xwezaya Kubayê, herwiha kêzik, mîş û mozên wê jî xwedî rengên metelmayî ne ku edetî devê meriv li ber wan rengan tê girêdan. Lebatên laşên meriv ên pêhesînê (duyu organî) bi hev re dikevin nava qerezkêşîyê çavnebarî; çav, dibêje xwezî ez ziman bûma û min ji wan çêjan bitahmijanda; ziman dibêje, xwezî ez çav bûma û min tîra dile xwe li van rengên ji xweşîkbûnê jî xweşîktir bineriyay.



Pelandina dest, xweziya xwe bi guh tîne; guh jî, xweziya xwe bi ya pelandina dest tîne. Û dil, bi cezba ji ser hişê xwe çûyî, hildigupe û ji dêlva hemû lebatên pêhesînê, hildigupe. Nola dewkileke Qerejdaşî, sehera serê sibê gulgûpîniyê ji meşka dew bîne û lepek rûnê malê wanî spî, nola berfa zozên li ser dêw bixîne. Hiiiilp û hey gulpl!

Hey xwedê! Tu çiqas nîgarkêşekî bêhempa yî. Devê meriv li ber nîgarkêşîya reng, deng û nîmetên te tê girêdan. Heke ez careke din bi xwe nequrincim û xwe ji vê xewna sêhrawî şiyar nekim, ez ê xwe di gerîneke xweşîkahiya vê xwezayê de xwe ji bîr bikim. Hingê ez xwe ji çûyîna ber tîra bîrdariyê ya Che Guevara mehrûm bihêlim.

Bajarê Santa Clara

Bajarê Santa Clara di navbera paytext Havana û çiyayê navdar Sierra Maestra de ye. Hêzên şoreşger ên Kubayê yên di bin fermandariya fermandarê efsanewî Ernesto Che Guevara de, li vî bajarî derba kujende li hêza dîktator Batista didin û piştê lê dişînin.

Loma jî, ji bo şanû şerefa Che Guevara, tîra wî ya bîrdariyê li tîketîna bajarê Santa Clara, li ser girîkekî çêkirine.

Beriya ez bihatama Kubayê bi çend salan, min kir û bira xwe kiribû. Lê hingê ji min re neserîfîbû. Çaxa min digot ez ê biçim Kubayê û tîra Che jî ziyaret bikim, hingê dostê min Mihemed digot "rehme li dê û bavê te. Wexta tu çû Kubayê, ji dêlva min ve jî li ber tîra wî xalê min Çegowera/Che Guevara fatîheyekê jî bixwîne"

Min jî ji wî re digot, niç! Ez ê li ber serê tîra wî, strana "îro çerxa şoreşê bere digerîne..." biqîrim.

Mihemed dikeniya, dikeniya, dikeniya û hêstir ji çavan diherikî. (Dostê min Mihemed, ji lephilanîna xwe re, mîrekî çê bû. Ji sivikahiya xwe re, nola tîremarekî bû. Awirê wî, nola awirê marê teyar/qobra bû. Beriya ez biçim Kubayê, Mehmedê delal di şerê li Kobênê de di bereya herî pêş de, nola şêrekî şer kir û nola şêrekî li wan hespên delal siwar bû çû gihîşt wan mirovên delal ên pakrewan)

Ernesto Che Guevara

Dijwar e ku meriv gotîneke heta niha der barê Che Guevara de nehtibe gotin bibîne û wê bîne ziman. Heta niha bi dehan pirtûk li ser jiyana vî dêwê ezamat a şoreşê hatine nivîsandin, bi dehan jî dokûmenter û filmên wî hatine çêkirin. Di torbendên medya dijital de jî, der barê wî de bi lodan agahî hene. Loma jî, ez ê hema qutber çend hevokan der barê Che de li hev bigobelînim.

Werin em hema ji nav û bernavê Ernesto "Che" Guevara dest pê bikin. Ernesto Guevara, nav û paşnavê wî ye. Baş e êdî ev "Che" ji ku hat? Che, li gorî hişmendîya kurdî, tê wateya "heval" Çawa di nava keç û xortên me kurdan de, bangkirina "heval" bi awayekî berbelav tê bikaranîn, di qinyata min de navê "Che" jî tê heman wateyê. Loma jî, pirtir wekî Che Guevara tê naskirin. Heke Che Guevara heta niha bijiya, wê teqez niha di nava refên qîz û xortên me de bûya. Gava van qîz û xortên me, bangî wî bikirna, wê bigotîna, Hevalê Ernesto. Baş e. Çima ne Heval Gîvara, çima Heval Ernesto? Ji ber ku em ne bi paşnav, em bi navê kesên ên zîkmakî bangî wan dikin loma. Ji ber vê yekê, li Kubayê Che Guevara ye, li ba me kurdan jî, Heval Ernesto ye. Ew qas.

Belê. Heval Ernesto, ango Che Guevara, gava xwendekarekî zanîngêhê yê beşa bişîşkiyê bû, li motorsiklêta xwe siwar dibe û nola hespekî serberdayî xwe li beariyên nediyariyê diqewimîne. Li parzemîna Amerîkana Latîn, li komikên merivên jar û belengaz rast tê. Bêdadî û stemkariyê bi çavê serê xwe dibîne. Qonax bi qonax tê heta Meksîkayê. Li wir, birayên Raûl û Fidel Castro nas dike. Ev her du bira, xwîniyên dîktator Batista ne û li Meksîkayê amadekariya despêka serhildaneke li hember dîktatoriya Batista dikirin. Che Guevara jî tev li amadekariya wan a serhildanê dibe. Hingê nîqaşên wan ên bi tîr (ateşî) li ser xizanî û bêdadîyê bûn. Nedigotin "zimanê me, çanda me qedexe ye" Digotin, "her diçe xizanî û bêdadî pirtir dibe." Her wiha mirina zarokên libeşîr jî zêde dibin.

Gava meriv rewşa kurdan a hingê dide li ber a xelkê Kubayê, meriv dibêje bavo wele şoreşa Kubayê, şoreşeke gelekî luks e; hema bibêje wan ji bitirî dest bi şoreşê kirine(!)

Ji ber ku hingê li kolanên bajarên kurdan axaftina kurdî qedexe bû. Zabit û gubhelên dewletê, li kuçeyên bajêr li dû gundiyan kurd ên penêrfiroş digeryan. Gava bidîtîna yek bi kurdî diaxivin, dest datanîn li ser penêrên wan, hêk û mirîşkên wan ên ji bo firotinê anîbûn bajêr û ji wan distendin. Wan gundiyan kurd ên jar û belengaz jî, bêyî şekirêkî ji zarokên xwe re bikirin, ew wanî polîpoşman bi çavên şil û bi devê kelogirî bi ser zarû zêçên wan de dişandin. Heta di wan deman de, rewşenbîr û feylozofê serdema me, Apê Mûsa Anter, ji ber bi kurdî fikandibû, hatibû zîndankirin.

Lema, gava ez wekî lêkolînerê kurd, şoreşa Kubayê dinirxînim, li gorî civaka ez endamê wê me, ji min re pir luks tê.

(Xwînerên ezîz, ez keserê kûûûr li vî derê rahildimijim)

Ma min ji we re qala çî dikir lo?! Hih! Hat bîra min. Erê lo, min ji we re qala hevnasandina Che û Fidel dikir. (Ez serê we neêşînim. Heke êşîya jî, şaşîkekê lêbigerîne.) Che Guevara, li gel Fidel Castro û heystê û du hogirên xwe yên din biryarê li vegera Kubayê didin. Ji Meksîkayê, li kelekeke piçûk siwar dibin û di bin destê tariya şeveke bi bahoz, xwe li pêlê deryayê diqewimîne. Navê keleka wan Granma ye, Granama, tê wateya "pîrê". Pîrê, ango keleka wan, nola kovîka berûyekê li ser pêlê û li bin pêlê hov ên deryayê dikeve. Ev koma şoreşgerên şeyda (çilgin) firtê firtê xwe digihînin peravê Kubayê. Gava derdikevin reşaya Kubayê, vêca hêzên Batista bi wan dihesin û li wan direşînin. Zêdeyî şêst kes ji

yekîneya Che û Fidel tîr kuştin. Yên mayî jî birîndar dibin. Bi vî awayî, bi baperka xwe digihînin Çiyayê Sierra Maestra.

Çiyayê Sierra Maestra

Çiyayê Sierra Maestra, çiyayê herî asê û bilinde. Bilindahiya xwe ya ji deryayê du hezar metre ye. Şoreşgerên Kubayê li çiyayê Sierra Maestra, gotina pêşengê bêtîrs û xof, Josê Martî yê efsanewî bi bîr dixin. Josê Martî gotibû "Çiyayê Sierra Maestra di destê kê de be, ew serdestê Kubayê ye."

Ji bo me kurdan çiyayê Zagrosan çibe, ji bo kubayîyan jî Sierra Maestra heman tişt e. Gava hêzên Fidel û Che xwe li çiyayê Sierra Maestra bi rêxistinî dikin, hema tavilkê radyoya bi navê Radyo Rebel ava dikin û dest bi weşana wê dikin. Radyo Rebel, tê wateya "radyo raperîn" Fidel û Che yên nola du pizotên êr, bi wê gotinbêjiya xwe ya bi tîr, bi rîya Radyo Rebel bang li gelê Kubayê dikin. Bi vî awayî gelê Kubayê, pêl bi pêl kaşî nava hêzên şoreşê dikin. (Gava ez van hevokan dinivîsim, ji serê çiyayê Zagrosê pêlên dengê radyoya Dengê Şoreşê li ber guhên min dikeve û nemir Şêrko Bêkes, bi wê sewta xwe ya biezamet diqîre: "lêre radyoya dengî şoreş e". Paşê jî nalînekê ji kûr de tê û li ber guhê min dikeve. Hebe tune be, ev nalîna Şivan Perwer e. Ma li ser rûkalê vî dinyalîkê, Kîjan hozan dikare nola Şivan, wanî ji kûrîhiya navdilê xwe ev çend ji dil wanî bînale! "Serê çiyaaaaa bi dûmaneeeee berxêêê minoo/Bîrîn kûreeee bê dermaneeeee bavêêê minoo!..." (Dê bidome)

